# ‘Dixwazin rastiyan berovajî bikin’

Serokatiya Konseya Rêveber a Koma Civakên Kurdistanê piştî wêneyên odeya girtîgeha wekî hucreyekê ku Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê de tê girtin, hatin weşandin, destnîşan kir ku desthilatdariya AKP’ê û dewleta Tirkiyeyê dixwaze ku raya giştî bixapîne û wiha daxuyand: “AKP û dewleta tirk dê nikaribin gelê me bixapînin û ji têkoşîna dilsoziya bi serokatiya xwe bidin rawestandin. Divê bê zanîn ku ne Tevgera Azadiya Kurdistanê, ne jî gelê kurd li hemberî vê bextreşiya kujerî ranaweste û dê çalakiyên xwe xurtir bike.”... RÛPEL - 5



# Li Îmraliyê di bin tecrîdeke giran de ye

Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan 11 sal in di bin tecrîdeke giran de ye. Mafê sohbetê, ragihandinê, axaftina bi malbat û xizman re heta niha bi awayekî nehiqûqî hatiye astengkirin

### LI ÎMRALIYÊ HIQÛQ TÊ BINPÊKIRIN

Li Girtîgeha Îmraliyê di nav van 11 salan de tu standardên navneteweyî nehatine bicihanîn. Rêvebirina Îmraliyê di bin venêrîna MGK û Navenda Krîzê ya Serokwezîrtiyê de tê meşandin. Saziyên mafên mirovan ên li Tirkiyeyê jî gelek caran bal kişandine ser nehiqûqiya li Îmraliyê.

### 260 ROJ CEZAYÊ HUCREYÊ

Di nav 11 salan de heta niha 16 caran cezayê dîsîplînê li Ocalan hate birîn. Her wiha hemû daxuyaniyên Ocalan û tespîtên civakî wekî rêvebirina rêxistinê hatin fêmkirin û bi tevahî 260 roj cezayê hucreyê li Ocalan hate birîn. Tirkiye li Îmraliyê hiqûqa xwe û ya navneteweyî binpê dike... RÛPEL - 8




# ROJEV

6 Kanûn - Yekşem 2009 E-mail: awelat2002@yahoo.com Buha: 50 Ykr Hejmar: 24




## Konferansa Sînemayê dest pê kir

Konferansa Sînemaya Kurd ku bi çalakiyên cur bi cur yên li ser sînemaya kurd pêk tên ku gelek sînemagerên kurd beşdar dibin û heta 13’ê kanûnê dê bidome bi nîşandana fîlmê Ghobadî dest pê kir...

ÇAND R 9

## Dîsa bombeya gazê dîsa zarok

Li Mêrsînê polîsan bombeya gazê avêtin malekê û di encama bombeya gazê de li malê şewat derket. Zaroka yek salî Zelal Bagiş ji mirinê filitî. Bavê Zelala biçûk, dê giliyê polîsan bike...

NÛÇE R 3



## Kirinên JÎTEM’ê hate vegotin

Di doza JÎTEM’ê de xizmên kesên ku ji aliyê ekîba Cemal Temîzoz ve hatine qetilkirin axivîn. Sercerdevan Kamîl Atak mexdûr tehdît kirin, Cemal Temîzoz jî xwe spart dema OHAL’ê...

NÛÇE R 3

# LI HER DERÊ SERHILDAN

Kurdistanî ji bo Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Kurdistanê, metrepolên Tirkiye û Ewropayê li ser piyan in. Çalakiyên ji bo protestokirina şertên Ocalan vediguherin serhildanê



### PEVÇÛN VEDIGUHERIN ŞERÎ

Duh li Çinar, Cizîr, Silopî, Riha, Semsûr, Edene, Îzmîr, Bazîd, Qoser, Nisêbîn, Gever, Sêrt û gelek bajarên din gelê kurd li ser piyan bû. Di çalakiyan de di navbera polîsan û gel de pevçûn derketin. Gelek kes birîndar bûn û qadên pevçûnan veguherîn qadên şerî.

### TÊKOŞÎNA RÛMETÊ DÊ BIDOME

Gelê kurd di peyamên xwe yên çalakiyan de dilsoziya xwe ya ji bo Ocalan tîne ziman û dixwazin şert û mercên Ocalan bêne başkirin. Her wiha tê destnîşankirin ku li hemberî tasfiyeyê gelê kurd dê tu carî dev ji têkoşîna xwe ya rûmetê bernede... RÛPEL - 4




## Gelê kurd ji bo azadiyê li ser piyan e

*Gelê kurd ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan li Kurdistan, metrepolên Tirkiye û Ewropayê bi şev û roj çalakiyên xwe li dar dixin. Li girtîgehan çalakiyên grevên birçîbûnê hatine destpêkirin. Li gelek bajar û navçeyan gel dikanên xwe venakin. Ligel daxuyaniyan bi meşên girseyî şertên ku Ocalan tê de ne, şermezar dikin...* RÛPEL 4-5

## Erdogan li hemberî gelê kurd şer îlan kir

Piştî Serokomarê Dewleta Tirk Abdullah Gul û Wezîrê Karên Hundir Beşîr Atalay, Serokwezîrê Dewleta Tirk Recep Tayyîp Erdogan jî gelê kurd wekî hedef nîşan da û gelê kurd wekî ‘terorîst’ îlan kir û wiha got: “Hêzên me yên ewlehiyê û dozgerên me li her derê çi pêwîst be dê bikin.” Bi vê yekê Erdogan talîmata şer da hêzên dewletê... RÛPEL - 4

## AKP nêçîrvaniya gelê kurd dike

Bi têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistanê re dewlet mecbûr ma ku bikeve nava çareseriyê. AKP jî neçar ma ku çareseriyeke xapînok gelê kurd bixapîne. Xwest ew destkeftiyên gel ku avantaj e vegerîne dezavantajê û li ser siyasetê bike.Xwest vê pêvajoyê bike malê xwe. Xwe mîna partiyeke demokratîk nîşan bide. Niha AKP nêçîrvan e û gelê kurd jî nêçîra AKP’ê ye... *Nivîsa Ş. ZAGROS* R.2

### Lîstik bi ser neketin, rûpoşa AKP’ê ket



Ji mêj ve hatiye gotin ku di şer de serkeftina herî mezin şikandina îradeya dijmin û dijberan e. Lewre jî şer bi tenê bi çekan nayê kirin, bi rêbaz û navgînên cur bi cur tê kirin...

SAMÎ TAN R 2

### Dewlet tiliya xwe dike kuna mozan



AKP pakêteke qaşo ya pirsgirêka kurd derxist hemberî raya giştî. Carina hêviyên ku pirsa kurd dê çareser be geşbûn carina jî weke mirov pifî findekê bike hêvî bi xew ve çûn...

MIZGÎN BÎNGOL R 5

# Di Modernîteya Kapîtalîst de peyva aştiyê tijî bi xefk e

Modernîteya kapîtalîst li hemberî tevgerên azadî û demokrasiyê her tim di nava hewldanên tasfiyekirinê de ne. Ji ber vê divê gelê kurd ji her demê zêdetir hişyar be

ŞANSTÊR ZAGROS


Ciwanên kurd li hemberî pêkanîn li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan divê li Kurdistanê û metrepolên Tirkiyeyê rewşa awarte îlan bikin. Çalakiyên herî dijwar gerek bi pêş bixin Hemû kurdên xwedî rûmet gerek li hemberî van pêkanînên li ser Ocalan bêdeng nemînin. Ji ber ku azadiya Ocalan tê wateya azadiya gelê kurd.

Di sîstemên desthilatdar ango kapîtalîst de pêvajoyên ku çareserî û aştî dikevin rojevê de xefk, dek û dolap di bin zimanê nerm de têne veşartin. Di heman demê de ligel pêşxistina nîqaşên der barê demokrasiyê de jî her tim rîskeke tasfiyeyê jî heye. Mirovên desthilatdar li ser rêbazên cuda yên tasfiyekirinê serê xwe diêşinin. Di rastiyê de li şûna serî li ser çareseriyê biwestînin û çareseriyê biafirînin zêdetir li ser tasfiyekirinê dihizirin. Ev siyaseteke hevbeş a modernîteya kapîtalîst e ku li hemberî tevgerên demokrasî û azadiyê ye. Van tevgeran dikişînin nîqaşên çareseriyê, eger bibe bi hin gav û pêşketinên erzan dixwazin wana têxin nava sîstemê û bêbandor bikin, marjînal bikin, eger nebe muzakereyên cur bi cur pêş dixin, hêviyên girîng didin van tevgeran û vana tev dixin xefletê û wan di rewşeke pir lawaz de digirin û dişkînin. Di dîrokeke nêzîk de ev siyaset li hemberî Pilingên Tamiliyan şopandin û darbeyên giran li wan xistin. Siyaseta li hemberî PKK'ê îro tê şopandin jî ji vê siyaseta navneteweyî ya modernîteya kapîtalîst cuda nîne. Lê PKK naşibe tu tevgerên din. Reseniyeke xwe ya pir girîng heye.

Rêberê Gelê Kurd bi rêbazeke xweser û bêhempa bingeha PKK'ê avêt. Di serî de xwedî bîrdoziyeke civakparêz, demokratîk û hemû qismên civakê bêyî ferq û ciyewazî têxe nav hembêz kir. Her tişt bi têgihiştina çêkirina şoreşê dest girt û her tim xwe li gorî pêdiviyên demê, civakê û bi taybet jinan guhert û veguhert. Ji tevahî serhildanên kurd cudatir gerdûnîbû û civakek-mirovek azad armanc kir. Di her wateyekê de xwe pêşxist, nû kir û pêwîstiyên mirovahiyê ji xwe re kir hîm… Ji ber vê siyaseteke kevneşop di rastiya PKKê de dê ne encamgir be û mehkûmê windakirinê be.

**AKP partiyeke sîstemê ye**

Lê dewleta tirk xwest heman şêwazê li hemberî PKK'ê bide pêkanîn. Pir aşkera ye ku AKP ne PKK'ê nas kiriye û ne jî gelê kurd yê PKK'î nas kiriye. Eger nas kiriba, dê neketiba nava helwesteke ewqas bêhiş. Eger zanîba birêz Ocalan nûneriya kurdê azad dike, vîna gelê kurd e û ne kesek e, gelek e dê hêj zêdetir bihişmendî tevbigeriya. Lê em dibînin ku gelê kurd piştî hilbijartinên herêmî yên 29'ê Adarê dewletê neçarê çareseriyê kir û xist nava lêgerîn û çareseriyên nû. Lê AKP çi kir? AKP jî neçar ma ku çareseriyeke xapînok gelê kurd bixapîne. Xwest ew destkeftiyên gel ku awantaj e vegerîne dezavantajê û li ser siyasetê bike. Got ez dê vekirina kurd bikim, piştre got vekirinên demokratîk û her wiha di van demên dawî de jî got yekitî û yekparebûn. Xwest vê pêvajoyê bike malê xwe. Di raya giştî de xwest îmajeke wisa ji xwe re ava bike. Xwe mîna partiyeke mirovhez, kurdhez û demokratîk dide nîşandan. Lê dema mirov meyzîne ev lafazantiya li ser demokrasiyê tê kirin bi zihniyeteke nêçîrvaniyê dike. Niha AKP nêçîrvan e û gelê kurd jî nêçîra AKP'ê ye. Nêzî hilbijartinan dibe û ji ber vê jî neçare girseya kurd nêzî xwe bike ku careke din were ser îqtîdarê. Niha derdê AKP'ê dê çawa di hilbijartinê de were ser îqtîdarê ye. AKP partiyeke konjoktûrê ye. Sîstem ango dewlet dixwazin bi riya AKP'ê kurdan têxin bin bandora xwe û ji PKK'ê qut bikin, niha eger AKP ev wezîfeya danîna pêşiya wî pêk neyîne, dê çem û çem here. Niha di nava panîkekê de ye, ka dê çawa xwe bi ser bixe.

**AKP, CHP û MHP wekhev in**

Lê mixabin hin kes ev lîstokên AKP'ê nabînin û dibêjin; li rexmî her tiştî AKP ji CHP û MHP'ê baştir e. Lê di rastiyê de nizanin ku ji partiyên din cudatir nîne, heta hêj xetertir e. Partiyên sîstemê ne. Çavkaniya van pirsgirêkên em îro dijîn ev sîstem in. Yên ku hê jî bawer dikin dê AKP çareseriyê bîne divê dev ji vê hizirandinê berdin.

Niha sabotekirina pêvajoyê AKP, di serî de DTP, CHP û MHP dide nîşandan û pêvajoya ku nîne di holê de wekî ev partî provoke dikin dide nîşandan û xwe bi vana rave dike. Eger yên aligirê me jî bêjin 'yên nahêlin çareserî pêş bikeve û li pêşiya hewldanên AKP'ê dibin asteng MHP û CHP ye' jî di nava xeletiyên mezin de ne û tên lîstika AKP'ê.

Divê baş were zanîn ku qet pêwendiya AKP'ê bi exlaqê siyasetê re nîne û ji bo berjewendiyên xwe xirabiya ku neke tune. Ev di rewşa Rêberê Gelê Kurd de jî bi awayekî aşkera derkete holê.

Dema mirovek temenê xwe yan mezin dibe, yan jî mirovekî pir gunehkar be zû ji hev dikeve û enerjiya wê ya li ser piyan bimîne namîne, ji lewma her timî mirina xwe dihizire cihê xwe amade dike û cihê ku tirba xwe lê çêbike bi destê xwe diyar dike û li benda mirina xwe ye. Ji ber dilê xwe rehet nîne. Lê di rastiyê de AKP bi navê nemiriniyê mirineke pêşwext ji xwe re tîne. Erdoxan mîna Gilgameş li dû nemiriniyê ye, lê nizane ku tirbeke pêşwext ji xwe re ango ji zihniyeta xwe ya sexte re dikole.

**Rûyê AKP'ê deşîfre bûye**

Her tişt êdî aşkera bû ku AKP ji bilî demogojiya demokrasiyê tiştek nekiriye. Êdî ew axaftin û peyvên xemilandî pênc qirûş nake. AKP xwest bi navê çareseriyê hinek tişt biguherîne û temenê xwe dirêj bike, lê ji ber di niyeta wê de tasfiyekarî hebû nekarî vê siyaseta xwe bibe serî. Ji ber carekê ketiye nava vê rewşê îcar nikare ji nav derkeve. Di aliyekî de rûyê madalyoyê yê xapandinê û di aliyê din de rûyê xwe yê rast yê wehşî dide nîşandan. Ev polîtîkaya tasfiye û îmhayê ji ber polîtîkaya dewletê ye hemû rêk diçin heman cihî.

Ev di rewşa birêz Ocalan de tam piştrast bû ku ka aliyê nerm ê dewletê xetere an jî aliyê hişk e. Ji ber vê sedemê wekî me li jor destnîşankiriye AKP bi agir lîstiye û dilîze. AKP ketiye riyeke jêneveger, lê jênevegerbûnekî êdî tune bibe. AKP bi pêkanînên li Îmraliyê rewşa xwe aloztir kiriye. Bizanin ku faturaya Îmraliyê çiqas buha ye. Êdî şîarên mîna 'AKP xwe şaş neke, sebra me teng neke' pêwîst e neyên gotin. Ma hîn dê dewlet ango bi taybet AKP ji vê xirabtir çi bike. Loma divê li gorî pêvajoyê û xeteriyan ziman êdî were guhertin, zimanekî lîberal û pasîf neyê bikaranîn.

**Rola ciwanan pir girîng e**

Em weke ciwanên kurd divê di Kurdistanê de rewşa awarte îlan bikin û li gorî wê çalakiyên xwe bi awayekî herî dijwar pêş bixînin. Yek, divê em ango her kurdeke/î xwedî rûmet û girêdayî Rêberê xwe û azadiya xwe di ya Rêberê xwe de dibîne zarokên xwe rênekin dibistanan, ji zarokên heft salî heta ciwanên zankoyê dibistanên ku navenda faşîzmê ne protesto bikin û heta rewşa Rêberê me neyê başkirin û neyê azadkirin em neçin dibistanan. Di Kurdistanê de di rêjeyeke diyar de karmend û karker hene divê ev jî bi heman şêweyî neçin ser kar û têkevin nava çalakiyan. Di Kurdistanê de di serî de AKP, CHP û MHP çi navendên wan yên partî û şaredariyên wan hebe divê em hilweşînin û wana ji welat biqewitînin. Her wiha li her devereke Kurdistanê navendên polîs û leşkeran heye, divê ev jî bi heman awayî werin hilweşandin û neçarê revînê werin kirin. Bi çelengên reş danîna ber avahiya wan re Rêberê me wê neyê azadkirin ne jî wê rewşa wî bê başkirin. Li dewsa çelengên reş divê navendên wan werin dagirkirin û ew werin qewitandin.

Divê di bajarên mezin de rawestgehên wesayîtan (otobûs, seyare, tren, kamyonetên mezin ên karkeran) werin dagirkirin, tekelên wan tev werin teqandin û bê karîger bimînin. Her wiha welatparêzên ku nikarin têkevin nava çalakiyan pêwîst e di cadeyên bingehîn de pêşî li wesayîtan bigrin û hinceta çalakiyên xwe ji xwediyên wesayîtan re vebêjin.

**Heta azadiya Ocalan**

Armanc; heta ku Rêberê Gelê Kurd negihije azadiya xwe, ji xwe azadiya Rêberê Gelê Kurd tê wateya azadiya gelê kurd. Her saeteke bê çalakî, bêdengî ji me re tê wateya mirinê. Ji ber vê çendê her kêlî bi Rêberiya xwe re divê bibe şîara me ya demê heta em Rêberê Gelê Kurd bigihînin azadiya wî. Ev tev dikevin berfirehiya prensîbên parastina rewa û parastina cewherî. Parastineke cewherî ya saxlem û bihêz dê mîsoger azadiyê di demeke kin de bi xwe re bîne.

Em dikevin qonaxeke nû û di heman demê de qonaxeke pir xeternak. Em weke gel ji her demê zêdetir nêzîkî azadiyê bûne. Her ku em bi hêz dibin hêzên desthilatdar jî li hember bihêzbûna me kompleksê dijî û bi çavreşî dikeve nava hewldanên bêhiş. Ji loma demên herî rêxistin û gel bihêz de ye de pêkanîn û komployên cur bi cur tên pêşxistin. Çima? Ji ber eger gel û PKK ne bi hêz be, jihevketîbe zêde hewce nabîne ku têkeve nava plansaziyên dorfireh, dibêje berde bila hêdî hêdî marjînal bibe. Lê di rewşa berovajî de ji ber di serkeftina vîna gel de dawiya hêzên dewletparêz dibînin ango dawiya xwe dibînin, ji ber vê yekê tu harbûn û dînatiyeke neke wê nebe. Jixwe ev çavreşiya xwe di pêkanînên li ser Rêberê Gelê Kurd de bi awayekî vekirî danîne holê. Bi van helwestan re di serî de AKP darê di bin lingê xwe de qut kiriye, ne ku qut dike. Divê em tev bi vê zanabûnê tevbigerin û kêliyekî xwe vala derbas nekin.

ROJEV
Zozan Basın Yayın Adına
İmtiyaz Sahibi: Eser UYANSIZ
Yazı işleri Müdürü: Mustafa AGGÜL
Yönetim Yeri: Diclekent Bulvarı Termil Apt. Kat:3 No: 9 Kayapınar / DİYARBAKIR
İdare Tel: 0 (412) 251 38 88
Yayın (Weşan)
Tel: 0 (412) 237 48 91 Fax: 0 (412) 237 48 89
Baskı(Çap):
Stenbol: Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basin Yayın Tan. San. Tic. Ltd. Şti., Telsizler Mevki Beşyol mah. Akasya Sok. No:23/A Küçükçekmece / İSTANBUL Tel:0 (212) 580 63 81
Edene: Arslan Güneydoğu Gazetecilik, Matbaacılık, Kağıtçılık, AŞ. İstiklal Mah. İstiklal Cad. No:44
Seyhan/ ADANA Yaygın Süreli Yayındır



Samî Tan
sberbeyan@yahoo.com

## Lîstik bi ser neketin rûpoşa AKP'ê ket

Ji mêj ve hatiye gotin ku di şer de serkeftina herî mezin şikandina îradeya dijmin û dijberan e. Lewre jî şer bi tenê bi çekan nayê kirin, bi rêbaz û navgînên cur bi cur tê kirin. Di serên serdema nû de rêbaz û navgînên şerê derûnî cihekî girîng û taybet digirin.

Bala xwe bidin şerê dewleta tirk a li dijî kurdan hûn ê vê rastiyê bi awayekî zelal bibînin. Hêzên dagirker û hevalbendên wan ên navneteweyî li gorî xwe bernameyek çêkiriye. Di vê bernameyê de şikandina îradeya kurdan, jihevxistina sazî dezgehên kurdan, belavkirina rêxistinî û pergala kurdan heye. Ji ber ku dagirker dixwazin ku kurd pêkhateyeke serbixwe, divê nebin xwedan îrade, xwedan sazî û dezgeh, divê nebin xwedan pergaleke xweser û demokratîk, ew divê di nav pergala heyî de bihelin.

Heta niha dagirkeran dixwest ku kurd ji aliyê çandî û zimanî ve ji holê rabin, bi temamî bibin tirk. Lê niha hate dîtin ku tiştekî wiha ne pêkan e, lewre jî dixwazin wekî pêkhateyeke herêmî û folklorîk hebûna xwe heta demekê bidomînin, lê di encamê de ji holê rabin.

Ji bo pêkanîna vê bernameyê hêzên dagirker bi hemû rê û rêbazan zorê didin kurdan, carinan bi kurtêlan carinan bi şimakan, carinan bi çekan bi ser kurdan de diçin. Heke pêwîst bike, ji bo wan ji desthilanînê bixin, carinan li ber wan jî digerin.

Her cure cudatiya di nava civaka kurd de dikin sedema dubendî û nakokiyan, dixwazin beşên û çînên cuda yên kurdan berî hev bidin, wan bikin neyarê hev. Her yekî çawa di nav xwe de pirdengî û pir-rengiyê wekî xetere dibînin û pir-rengî û pirdengiya di nava kurdan de jî dixwazin bikin bingeha şer û pevçûnan.

Li ser vê bingehê di nav DTP'ê de li dubendî û nakokiyan digerin, di nav PKK'ê de li nakokî û dubendiyan digerin, di navbera PKK û DTP'ê de di navbera hikûmeta Başûr û PKK'ê de dixwazin şer pevçûnan derxin. Ji mêj ve li pey wê yekê ne ku hinek kesan bigihînin hev û ji Tevgera Azadiyê re bikin rikeber û dijber. Mixabin pirî caran hinek derdor vê rastiyê nabînin ku dema çapemeniya tirk mîkrofonê dide ber devê wan, xwe winda dikin û çi tê ber devê wan dibêjin.

Plana dagirkeran zelal û diyar bûye, heta niha wan dixwest bi çend gotinên xweş dilê kurdan geş bikin û wan ji hêza desthilanîn û berevaniyê bixin û bi vî awayî bernameya xwe bibin sêrî. Lê niha diyar bû ku kurd bi vê yekê naxapin, lewre jî wan rûpoşa xwe danî aliyekî û rûyê xwe yê rastîn nîşanî her kesî da. Li aliyekî pergala li Girava Îmraliyê ji berê xerabtir dikin, aliyê din doza girtina DTP'ê tînin rojevê, ne dûr e ku nêzî biharê dîsa dest bi operasyoneke li ser Başûr bikin.

Lê bila her kes bizane ku gelê kurd ji niha pê ve ji bilî çareseriyeke rastîn tiştekî napejirînin. Şerê taybet ê dagirkeran heta niha bi ser neketiye, ji niha pê ve jî bi ser nakeve. Lê divê were zanîn ku kêşeya kurd êdî ketiye qonaxa çareseriyê, tu hêz nikarin rê li ber vê yekê bigirin. Dek û dolabên xapandinê dê çareseriyê derengiyê bixe, lê nikare rê li ber çareseriyê bigire, di encamê de dê doza aştî û azadiyê bi ser bikeve.

# Şahidan wehşeta JÎTEM'ê vegot

**Di doza JÎTEM'ê de xizmên kesên ku ji aliyê ekîba Cemal Temîzoz ve hatine qetilkirin axivîn. Sercerdevan Kamîl Atak mexdûr tehdît kirin, Cemal Temîzoz jî xwe spart dema OHAL'ê**

Di 6'emîn danişîna doza 7 bersûcên ku Fermandarê JÎTEM'ê Cemal Temîzoz û Sercerdevan Kamîl Atak jî di navde li 6'emîen Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hate dîtin de maxdûrê bi navê Sabrî Gasyak diyar kir ku birayê wî yê 13 li gel 4 kesan hate kuştun û di vê bûyerê de Fermandar Temîzoz rapora "Ji aliyê cerdevanan û PKK'ê ve hate kuştin" amade kir. Di danişînê de Sercerdevan Kamîl Atak, bi gotina "Hêza min heye vê hêza min tahrîk nekin" gef li mexdûran xwar. Temîzoz jî xwe spart dexlê OHAL'ê.

6'Emîn danişîna doza 7 bersûcan a Fermandarê JÎTEM'ê Cemal Temîzoz, Sercerdevan Kamîl Atak, Tamer Atag, îtîrafkar Hidir Altug, Adem Yakîn, Firat Altun (Abdulhakîm Guven) li 6'emin Dadgeha Cezayê Giran a Amedê hate dîtin. Di danişîna ku nêzî 14 saetan domkir de maxdûr hatin guhdarkirin.

**'JÎTEM'ê ji mal birin'**

Hevsera Abdullah Efeltî Besne Efeltî diyar kir ku hevserê wê dema diçû zeviya Hasan Şik biçînê ji aliyê Cemal Temîzoz ve hatibû astengkirin û ji ber hevserê wê tirsiya êdî dest ji çandiniya zeviyê berda. Efeltî, da zanîn ku her roj leşker dihatin mala wan û hevserê wê dipirsîn ji ber vê yekê nêzî 20 rojan hevserê wê newêrîbû biçûya mal. Efeltî anî ziman ku dema hat malê li ser riya xwe çû Qereqola Yankele û bi rayedarên leşkeriyê re hevdîtin çêkir û hate mal. Elfetî destnîşan kir ku piştî hevserê wê du rojan li mal ma, roja din leşkeran mala wan dorpêç kir û piştre du texsiyên bêplaqe hatin ber derî û cerdevan û endamên JÎTEM'ê jê daketin xwar. Besna Efeltî got ku hevserê wê û kurê wê birine. Efeltî, got ku beriya hevserê wê bê binçavkirin rojek berê gotibû "Temîzoz gef li min xwarin. Dê min bikuje. Dema ez birim, bi şopa min kevin" Elfetî, piştî 2 mehan keyayê gundê Katranê diyar kir ku li duriyana Kijên cesetek dîtiye û wiha dom kir: "Min ceset nedît, lê piştî wêne nîşanî min dan ez hînbûm ku hevserê min e. Piştre dozger bang min kir û cuzdana wî dan min. Lê ji tirsan min serî li rayedaran neda û min gilî nekir."

Piştre birayê Abdulazîz Gasyak, Sabrî Gasyak îfade da. Gasyak, têkildari kuştina Omer Candoruk, Yahya Akman, Suleyman Gasyak û Abdulazîz Gasyak ku di adara 1994'an de hatin kuştin û li Birên Botaşê mirî hatin dîtin de îfade da. Sabri Gasyak anî ziman ku dema birayê wî hate kuştin ew 13 salî bu û wiha got: "Birayê min cigare difrot. Bi sê hevalên xwe re çûn Sîlopiyê. Li Birên Botaşê hatin binçavkirin. Birin gundê Holant. Piştre 500 metre dûrî Qereqola Gundê Havuzlu kuştin. Ji bo em birayê xwe bibînin me serî li emniyeta Sîlopiyê da. Li wir ji me re gotin 'Li birayê xwe negerin, hûn ê jî di riya wî de biçin' Emîne Tadîk bû şahidê kuştina 4 kesan. Piştî malbata me çûn cihê bûyerê ew definkirî dîtin. Piştre li gel leşkeriyê ew birin Morga Nexweşxaneya Dewletê ya Cizîrê. Wê demê Temîzoz jî hat ber nexweşxaneyê û gef li me xwar. Ji me re got 'Ji bo van kesan tu tiştî nekin û nepirsin. Ger ku hûn bi pey şopa wan kevin, hûn jî dê mina wan bibin'. Piştre jî Temizoz rapora 'Ev cerdevan in û ji aliyê PKK'ê ve hatine kuştin' amade kir.

Gasyak, destnîşan kir ku ligel ekîba Temîzoz, ekîba polîsê bi lakabê Ramazan Hoca yê girêdayî Midûriyeta Polisan a Cizîrê jî hebû û wiha dom kir: "Ramazan Hoca birayê min Reşat Gasyak 3 caran qasî 15-20 rojan binçav kir û îşkence lê kir. Piştî 4 kes kuştin, JÎTEM'ê wesayita Omer Candoruk bi qazî 7 mehan bikar anîn. Min dit ku Abdulhakîm Guven, Adem Yakin, Hoca Selîm, Hidir Altug û Cebbar wesayita Candoruk dajotin. Hemû derdor ji vî ekîbî ditirsiyan û zanîbûn ku mirovan dikujin." Piştî îfadeya maxdûran Parêzerê mexdûran Tarîh Elçî mafê axaftinê girt û diyar kir ku ew darizandina herî dijwar dikin. Elçî wiha got: "Kesê li hemerî be rêxistina sûcê herî mezin e. Kesên ku delîlan kom bikin û suç û sucdaran aşkera bikin niha li vir têne darizandin. Ev rêxistina suc tenê ji Cemal Temîzoz pêk nayê. Piştî îfadeyên mexduran îtîrafkar Adem Yakîn got "Me qralê têkoşîna bi terorê re meşand". Sercerdevan Kamîl Atag jî gef li derdorê xwarin û wiha got: "Weki parêzeran got hêzek min a mezin heye. Bila ev hêz tahrîk nebe. Bila kurê min Tamer serbest bê berdan û li wê hêzê xwedî derkeve."

**Temîzoz xwe spart OHAL'ê**

Temîzoz jî diyar kir ku li herêmê dewlet di bin dehditek mezin de bû û wiha got: "Pirsgirêkê me yên hebûn û ewlehiye hebûn. Malbaten li cem dewletê cih digirtin di bin gefan debûn."

Piştî îfadeyan Heyeta Dadgehê biryara berdema girtina 7 bersucan da û taloqî 8'ê cile kir. **AMED (DÎHA)**





## Dîsa aqûbeta windayan pirsîn

Xizmên kesên ku ji aliyê dewletê ve hatine windakirin û Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) li Amed û Êlihê çalakî li dar xist. Li Îzmîrê jî ÎHD'ê bernameya hefteya mafên mirovan aşkera kir.

Li Amedê parazvanên mafên mirovan û xizmên windayan cara 43'emîn çalakî li dar xist. Di çalakiya ku li Parka Koşuyoluyê hate lidarxistin de Sekreterê ÎHD'a Amedê Burhan Zorooglu bal kişand li ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan. Her wiha di çalakiya vê hefteyê de çîroka windakirina Faîk Kevciyê du 1993'yan de hatibû windakirin hate vegotin. Burhan Zorooglu diyar kir ku şert û mercên Ocalan pir giran e û heke hikûmet samîmî be bila heyete serbixwe ya navneteweyî bişîne Îmraliyê.

Piştî axaftina Zorooglu, rêveberê ÎHD'ê Racî Bîlîcî çîroka windakirina Faîk Kevcî vegot. Bîlîcî diyar kir ku Kevcî di sala 1993'yan de ji aliyê 3 kesan ve hatiye revandin û piştre jê agahî nehatiye girtin.

ÎHD'a Êlihê ji bo balê bikêşin li ser rewşa kesên ku hatine windakirin li kolana Gulîstanê çalakî li dar xistin. Serokê ÎHD'a Êlihê Osman Kunteş û gelek kes beşdarî çalakiyê bûn. Di çalakiya vê hefteyê de çîroka windakirina Îzettîn Seven ê di 1998'an de hatibû windakirin hate vegotin. Serokê ÎHD'a Êlihê Osman Kunteş di çalakiyê de got ku divê berpirsyarên kesên ku hatine windakirin bêne dîtin û darizandin.

Piştî axaftinan 5 deqîqe çalakiya rûniştinê hate lidarxistin.

**Bername aşkera kirin**

Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) a Îzmirê, bernameya bi munasebeta "Hefteya Mafê Mirovan" aşkere kir. ÎHD, dê di navbera 10-17'ê kanûnê de bernameyên cuda pêk bîne.

ÎHD'a Îzmirê, bernameya bi munasebeta "Hefteya Mafê Mirovan", dê di navbera 10-17'ê kanûnê de bernameyên cuda pêk bîne. Plansaziya bernameyan wiha ye: 10 kanûn, ÎHD, ÇHD û TÎHV, dê li ÎHD'a Îzmirê daxuyaniyek hevbeş bidin. Di heman rojê saet di 16.00'an de dê ji ÎHD heta Qada Komarê ya Konakê meşekê pêk bînin. 12 kanun, dê ji bo windayan li ber Sumerbanka Konakê pêşengeh vebe bernameya muzîk û sinevizyon pêk were. 16 kanun, dê ji bo girtiyên nexweş li Postexaneya Konakê nameyan bişînin. Di 17'ê kanûnê de jî bernameya girtinê pêk were. **AMED / ÊLIH - ÎZMÎR**

## Ciwan berê xwe didin çiyayên azad

Di merasîma 31'emîn salvegera damezirandine PKK'ê de 70 şerwanên nû piştî piştî perwerdeyê tevli HPG'ê bûn. Di nava 5 mehan de 591, di nava 9 mehên dawî de jî 787 şervanên nû tevli refên HPG'ê bûn.

Pîrozbahiyên salvegera damezirandina PKK'ê li çiyayên Kurdistanê didome. Di pîrozbahiyan de bi merasîmeke 70 şervanên nû yên ku ji Dibistanên Şehîd Erdal perwerde bûn tevli HPG'ê bûn. Di maresîmê de endamê Navenda Parastina Gel Riza Altun axaftinek kir. Altun got ku ew di pêvajoyeke girîng de derbas dibin. Gelek pêşketinên siyasî diqewimin. Nîşaneyên serkeftinê û rîsk jî pir hene. Altun bal kişand li ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan û got ku dewlet li aliyeke tecrîdê giran dike li aliyê din jî operasyonan zêde dike.

Altun got ku heke li gorî hesasiyetên pêvajoyê tevbigerin dê encamên baş derkeve holê. Ev yek girêdayî sekna wan e.

**Bi ciwan beşdar bûn**

Tevlibûnên ciwanên kurd ên HPG'ê di mehên dawî ango hikûmeta Tirkiyeyê nîqaşên qaşo çareseriyê dike de zêde bû. Di 5 mehên dawî 591 şervanên nû tevli HPG'ê bûn. Ji meha adarê heta niha jî 787 şervanên nû piştî perwerdeyê tevli HPG'ê bûn. **BEHDÎNAN (ANF)**

## Zaroka yek salî birîndar kirin

Li Mêrsînê polîsan bombeya gaze avêtin maleke û di encama bombeya gazê de li malê şewat derket. Zaroka yek salî Zelal Bagiş ji mirinê filitî. Bavê Zelala biçûk, Remazan Bagiş diyar kir ku keça wî di encama bombeya gazê de nexweş ketiye û dê der barê polîsan de gilî bike. Bagiş got ku dema ku polîsan bombeya gazê avêtine malê, li malê şewat jî derketiye. Keça wî bi tesadufî xilas bûye. Her wiha Bagiş xwes tu polîsên berpirsyar bên darizandin. Ji ber vê yekê jî serî li Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) da û alîkariya hiqûqî xwest. **MÊRSÎN**

## Bi gefa kuştinê ciwanan dikin ajan

Li Êlihê ciwanên bi navên M. O û Y. O. diyar kirin ku polîsan bi gefa, "Hûn nebin ajan em ê krtên we yên kesk betal bikin û we bikujin" li wan kirine daxuyandin ku bi taybetî ji wan hatiye xwestin biçin DTP'ê û bizanibin ka ciwanên DTP'î çi dikin. Ciwananxuyand bi boneya ewlehiya canê wan tune ye dê serî li ÎHD'a Êlihê bidin.

Li Êlihê hewildanên ajankirina ciwanan bi hemû rêbazan berdewam dike. Ciwanê bi navê M. O. yê 18 salî daxuyand ku çend meh berî niha ji hêla polîsan ve li Kolana Amedê hatiye rawestanin û li hemberî pereyan teklîfa ajantiyê ji bo wî hatiye kirin. M. O. diyar kir ku gefa, "Tu ji bo meajantiyê nekî me dê qartên kesk ên malbata te bi tevahî betal bikin û te bikijin" lê hatiye kirin. M. O. anî ziman ku ji ber ku bavê wî nexweş e pêşiyê ev teklîfa wan ji tirsan qebûl kiriye û wiha axivî: "Ji min xwestin ku ez derbarê ciwanên DTP'yî de ka çi dikin, li kû dimînin û bi çi re eleqedar dibin ji wan re bêjim. Her tim çek nîşanî min didan. Gefa mirinê li min dikirin. Ji tirsan min ev daxwaza wan qebûl dikir. Ez diçûm DTP'ê min derbarê wan de agahî ber hev dikirin. Her tim ez dişopandim. Ez gelek poşman im. Ez naxwaim hevalên xwe bidim dest û ez gelek poşmanim. Ez şerm dikim li rûyê hevalên xwe binêrim."

**'Bi zorê ez kirim ajan'**

Y. O. jî daxuyand ku 9 meh berî niha li Aydinê bi endamekîJÎTEM'ê yê bi navê Hasan nasiye û wiha got: "Ez li înternet kafeyê bûm. Dema ez rabûm pereyê min da û piştre ji derve bi min re axivî. Piştre teklîfa pere ji min re anî xwest ez bi wan re bixebitim. Xwestin ez biçim DTP'ê ji wan re agahiyan bînim. Ez demekê li Aydinê çûm DTP'ê û hatim. Min der arê ciwanên li wir de agahî didan polîsan. 9 meh berî niha malbata min ji Aydinê bar kir hate Êlihê. Endamê JÎTEM'ê Hasan li dû min hate Êlihê. Ez bi kesekî din dam nasîn. Xwestin ez li Êlihê ajantiyê bikim. 3 caran pere dan min. Bi tevahî 450 TL dan min. Ji min re gotin 'Te hêj tiştek nekiriye ji bo wê em pere nadin te. Tu baş agahiyan bîne em ê her tim pere bidin te'. Min ji wan re got ku ez naxwazim ajantiyê bikim û ez poşmanim. Lê ez bi kuştinê tehdît kirim. Ji tirsa min berdewam kir. Cardin min nexwest ez vî karî bikim lê vê carê li min xistin. Gotin 'Here bi ciwanan re bikeve nav çalakiyan û piştre jî agahiyan ji me re bîne'. Ji min re gotin ku destûr nadin ez bikevim tu karan û ku ez karek peyda bikim jî dê min derxin. Ez gelek poşmanim. Ez şerm dikim li rûyê mirovan binêrim."

Y. O. diyar kir ku hêj gef li wî tên kirin û carekê birine Qereqola li Gundê Gilbarajkê û gef li wî xwarine. M. O. û Y. O daxuyandin ku ewlehiya canê wan nemaye û ji bo vê yekê dê serî li ÎHD'a Êlihê bidin û alîkariya hiqûqî bixwazin. Ciwan daxuyandin ku gelek şerm dikin û ji gelê kurd lêborîn xwestin. **ÊLIH**

www.arsivakurd.org

# Bazara Erdogan PKK ye!

**Sibê serdana Serokwezîrê Tirk Erdogan a Washingtonê dest pê dike. Hemû daneyên heyî destnîşan dikin ku di vê serdanê de mijarên wek Afganistan, Îran û hevkariya gemar a Tirkiye û DYA'yê ya li dijî PKK'ê dê bibe bazara nav Erdogan û Obama**

Serdana Serokwezîrê Tirkiyeyê Recep Tayîp Erdogan a Washingtonê sibê dest pê dike. Di vê serdanê çend mijarên esasî hene. Di nav vana de mijara Afganistan û Îranê ji bo Amerîkayê pir girîng e û ji bo Tirkiyeyê jî mijara PKK'ê. Ji ber vê jî ev serdan pirtir ji van aliyan ve bi baldarî tê şapandin.

Beriya ku serdana Erdogan dest pê bike Amerîkayê bi awayekî aşkera ji Tirkiyeyê daxwaza leşkeran kir. Hem sefîrê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) yê Enqereyê û Wezîra Karên Derve ya Amerîkayê Hillary Clintonê ji Tirkiyeyê xwestin ku ji bo şerê Afganistanê leşker bişîne.

Li ser vê hin daxuyanî ji Tirkiyeyê jî hatin dayîn. Di van daxuyaniyan de li dijî şandina leşkeran tu kesî tiştek negot. Di hemû daxuyaniyan de ji bo qadên şer rezerv hatin danîn. Hat gotin: "Bila leşker biçin lê di qadên şer de li dijî mîlîtanên Talîbanê nekevin şer. Tenê li waregehên navendî yên wek Qabîlê peywirê bikin.

Di vê der barê de daxuyaniya Wezîrê Parastina Tirkiyeyê Vejdî Gonul û Hîkmet Çetîn ku demên borî de li Afganistanê wek waliyên dagirker peywir kir balkêş bûn. Her du daxuyanî jî wek hev bû û fikarên ji bo şer şandina leşkeran dianî ziman.

Ev jî di nav xwe de bersiveke erêniye. Ne ji bo qadên şer lê ji bo peywira navendî şandina leşkerên tirk pesend dike.

Bi van daxuyaniyan raya giştî ya tirk jî hat aştkirin. Wek ku vaye 'hikûmet leşker naşîne şer lê ji bo peywirê dişîne Afganistanê' derket pêş.

### Helwesta rayedarên DYA'yê

Rayedarên DYA'yê ev daxuyanî maqûl binav kirin. Li ser mijarê Şêwirmendê Ewlehiya Neteweyî ya Amerîkayê Orgeneral James Jones daxuyanî da. Diyar kir ku DYA biryara Tirkiyeyê erênî pêşwazî dike.

### Stratejiya Obama ya nû

Serokdewletê DYA'yê Barack Obama di nav hefteya borî de stratejiya nû ya Afganistanê aşkera kir. Di stratejiyê de tê xwestin ku ji bo şerê li Afganistanê 33 hezar leşkerên nû bên şandin. Di çarçoveya stratejiya şer a nû de ji endamên NATO'yê jî tê xwestin ku ji bo şer leşker bên şandin. Ji bo vê 25 welatên endam ên NATO'yê qewlê şandina 700 hezar leşkerî dan.

### Rûyê qirêj ê bazarê

Mijara herî esasî bazara li ser PKK'ê ye. Erdogan beriya ku biçe li dijî Serokê Gelê Kurd Abdullah Ocalan êriş dest pê kir. Li ser navê başkirina cihê Ocalan hucreyek ku wek bîrekê ye hat çêkirin û ew kirin wê. Kurd rabûn ser piyan.

Lê ji ber ku beriya serdana Erdogan ev tişt pêk hat pirtir bal kişand ser xwe û bazara li ser PKK'ê ya nav Tirkiye û DYA'yê.

### Di ser Îranê de bazar

Çawan ku DYA dixwaze li Afganistanê destê xwe xurt bike, Tirkiye jî dixwaze li dijî PKK'ê desteka Amerîkayê ya fiîlî bigire. Her wiha komîta sêalî ya ji tirk, amerîkî û iraqiyan pêk tê amadekarî dikin ku biçin kampa Mexmûrê da ku penaberên kurd aşt bikin û ji bo vegerê amade bikin.

Dan û standinên bi vî rengî nav her du welatan ji nêz ve tê şopandin. Di vê çarçoveyê de polîtîkayên Tirkiyeyê yên li ser Îranê jî di nav vê hevkariya gemar de tê nirxandin. DYA ji bo Tirkiye pişt nede Îranê bazara li ser PKK'ê zêdetir derdixe pêş.

Ew bi nirxandin û analîzên xwe dixwazin bala Tirkiyeyê bikişînin. Li gor analîz û nirxandinan hevkariya Tirkiyeyê ya li dijî PKK û bi giştî gelê kurd xizmetî çareseriyê nake. Didin zanîn ku berjewendiyên gelê tirk û kurd bi giştî berjewendiyên herêmê ya aştiyê bi hevkariya kurdan û tirkan pêkan e. Diyaloga çareseriyeke wisa ya ji bo aştiyê jî di nav PKK û hikûmeta tirk de pêkan e.

Di rewşa heyî de li Afganistanê hezar û 750'î leşkerên tirk hene û Tirkiye hê jî Fermandariya Herêma Qabîlê ya Hêza Alîkariya Ewlehiya Neteweyî ya Afganistanê (ISAF) dike. **AMED**



## Fikara ji Tirkiyeyê

**KOMA** Dostaniya Tirkiyeyê ya Meclîsa Nûneran a Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA) bang li Tirkiyeyê kir da ku li dij polîtîka Îranê ya der barê nukleerê de ligel DYA û civaka navneteweyî cih bigire.

Di daxuyaniya ser navê komê de pesnê têkiliyên Tirkiye-DYA'yê hat dayîn. Hat gotin ku têkiliya Tirkiye DYA'yê ji mêj ve ye û stratejîk e.

Komê serdana Serokdewletê Tirk Tayyîp Erdogan a Washingtonê ji bo lipêşxistina aborî, siyaset û ewlehiyê wek derfetekê destnîşan kir û ji Erdogan xwest ku vê derfetê baş bi kar bîne.

Komê ji bo mîsyona Tirkiyeyê ya Afganistan û Iraqê jî erênî nirxand û piştgiriya xwe ya ji bo normalîzekirina têkiliyên Tirkiye–Ermenistanê desteka xwe da.

Di Koma Dostaniya Tirkiye û DYA'yê de 100 parlamenter cih digirin. Beriya serdanên wisa yên Tirkiyeyê dest bi lobiyê dikin da ku şert û mercên siyasî li gor berjewendiyên Tirkiyeyê birêxistin bikin. Di vê lobiyê de fikara herî mezin ya komê ev e ku Tirkiye li dijî polîtîkayên nukleera Îranê cih negire. Heke pêvajoyek wisa rû bide dê nav Tirkiye û DYA'yê aloz bibe ku ev koma dostaniyê hewl dide ku ji niha ve pêşî li vê bigire. **WASHINGTON**

# Li Everestê civîna balkêş

Hikûmeta Nepalê bo ku bal bikişîne ser bandora germahiya avhewayê ya li ser Hîmalayayan civîna desteya wezîran ya hikûmetê li çiyayê Everestê çêkir.

Civîn di bin serokatiya Serokwezîrê Nepalê Madhav Kumar de dest pê kir. Desteya wezîrên Nepayê di danişîna li Everestê de belgeya bandora germahiya avahewayê ya li ser Hîmalayan hat erêkirin.

Serokwezîr û Desteya Wezîran maskeya Oksîjenê û paltoyên qalind li xwe kirin û çûn civînê. Ji bo civînê 20 wezîr bi helîkopterê çûn bilindiya 5 hezar û 242 metreyan. Wezîran di rasteya ku bi navê Kalapathar tê zanîn di binê hewaya qeşayî de dest bi civînê kirin. Cihê navborî wek kampa destpêkê ya esasî ku çiyager ji wê dest bi rêwîtiya Everestê dikin bi kar tê.

Li Nepalê 8 lutkeyên bilind hene ku di nav 14 lutkeyên bilind ên cîhanê de cih digirin. Ji ber vê jî Nepal wek wergeha çiyagerên cîhanê û qiblageha turîstan tê qebûlkirin. Nepal ji bo hawirdorê û germahiya avhewayê pir hesas tevdigere. Ji ber vê jî pir baldar nêzîkê gaza serayê dibe. Nepal tenê ji ber ji sedî 0,025ê gaza serayê ya nav atmosferê berpirs e.

### Di bin avê de civîneke baldar

Hikûmet û derdorên baldar hesas bo ku balê bikişînin ser mijara germahiya avhewayê û mijarê pirtir bixin rojeva cîhanê gavên balkêş diavêjin. Hikûmeta Malîvler jî ji bo vê baldariyê civîna xwe di bin avê de çêkiribû.

Pispor diyar dikin ku ji ber germahiya avhewayê ya cîhanê di nav 50'î salên pêş de qeşayên Hîmalayan yên wek çavkaniya 10 rûbarên Asyayê tên zanîn ji holê rakin.

Wezîrê Daristanê Deepak Bohara di serê hefteyê de li ser mijarê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de destnîşan kir ku mirovahî cezayê ku bi bedelê xwe pêk aniye dikişîne. Wezîr xwest ku welatên pêşketî ji bo germahiya avhewa û bandora xwe ya li ser Hîmalayan alîkariya zêde bidin. **SYANGBOCHE**




# Di qulûba şevî de teqîn: 102 mirî

Li bajarê Perm a Rûsyayê di qulûbeke şevê de teqîn pêk hat û 102 kesî jiyana xwe ji dest dan. Hezar û 200 kîlometra li rojhilatê paytexta Rûsya Moskowayê li nêzî çiyayên Uralê di quluba şevê de teqîn pêk hat.

Teqîn di saet 22.15'ê şevê de çêbû û 102 kesî jiyana xwe ji dest dan. Ji ber teqîna quluba şevê ji 140 kes jî birîndar bûn.

Li ser mijarê Wezîrê Rewşa Awarte ya Rûsyayê daxuyanî da. Di daxuyaniyê de diyar kir ku têkiliya teqînê bi terorê re nîn e.

Bi teqînê re di nav qulubê de aloziyeke mezin dertê û pirtirê miriyan ji ber gaza karbonmonoksît jiyana xwe ji dest didin.

Serokdewletê Rûsyayê Dîmîtrî Medvedev û Serokwezîrê Rûsyayê Vîladimîr Pûtîn der barê mijarê de ji rayedaran agahî girtin.

Hefteyek berê jî li Moskowayê trênek ji ber sabotajê ji rê derket û bi dehan kes hatin kuştin û rêxistinek oldar sabotaj girt ser xwe. Ji ber bûyerên wisa di nav raya giştî de nêzîkatiyên şikbar rû dide. **MOSKOW**

# Plana çalakiyên 5 salan a antî-mayinan

Di Konferansa Revîzyona Peymana Ottowayê ya Duyemîn a mayînên antî-personel de planan çalakiya 5 salan derket holê û alîkariya 500 hezar mexdûrên mayinê bê kirin.

Civîna yekemîn ya Revîzekirina Peymana Ottawayê ya miyînên antî-personel (ICBL) di sala 1999'an de li Norveçê û a duyemîn jî li bajarê Cartagena ya Kolombiyayê roja înê çêbû.

### Qewlê dewletan nîn e!

Midureya ICBL'ê Sylvîe Brîgot li ser mijarê daxuyanî da. Diyar kir ku biryar hat girtin planek şênber e û li gorî berjewendiyên cîhanê xwedî nexşeriya çalakiyê ye. Hat gotin ku konferansê hinek şaşwaz hiştin. Dihat gotin ku Konferans dê nikaribe encamekê derxe. Lê wisa nebû. Konferans bi biryarên girîng bi dawî bû. Brîgotê da zanîn ku welatên alîgir bê ku tavîz bidin helwest nîşan dan. Lê delegasyonê Misirê Ayman Sorur hê bi hesab peyîvî û wiha pêde çû: "Ev tenê biryarên siyasîne. Em di vê mereheleyê de nizanin ku dê dewletên alîgir destekê bidin kijan biryar.'

### Piştgiriya malî pir lawaz e

Tê gotin ku ji bo piştgiriya malî welatên ku qewlê xwe didin pêk nayînin. Di nav 5 salan de ji Awustralyayê ji bo bernameyên mayîna 91 milyon dolar soz dabû, Hollanda di dusalan de 30 milyon ewro alîkarî daye.

### 2,5 milyon mayin

Di rapora meha kanûnê ya ICBL'ê de ji sala 1999'an û şûn ve wan li cîhanê 2,2 milyon mayinên antî-personel û bi qasî 250 hezar mayinên wesayîtan paxij kirine.

### 4 Welat paqij kirin

Li gor çarçoveya ku hat aşkerakirin li 86 welatan stoqên mayinên anti-personel hatine îmhakirin. Li Rûsya û Burmayê mayinên antî-personel bikar tên . Ji sala 1999'an û şûn ve li li Arnavutluk, Yewnanîstan, Rûanda û Zambiyayê bi giştî hat paqijkirin

### Li Tirkiyeyê milyonek

Tirkiyeyê ligel ku peymanê mohr kiriye jî Hewildana Em Tirkiyeke bê Mayîn Dixwazin diyar kir ku milyonak mayinên çandî yên antî-personel û 3 milyon mayînên stok kirî li Tirkiyeyê hene. Ev mayin jî pirtir li kurdistanê li dijî kurdan û gerîlayên PKK'ê hatine çandin. **CARTAGENE**

www.arsivakurdi.org



# Pêkanînên Îmraliyê tu caran li gorî zagonê nebûn

**Ocalan 11 sal in di bin tecrîdeke giran de ye. Mafê sohbetê, mafê ragihandinê, mafê axaftina bi malbat û xizman re heta niha bi awayekî bêdadî hate astengkirin û heta niha 16 cezayê dîsîplînê lê hatin birîn**

Ligel ku Wezareta Dadê îdia dike ku Girtîgeha Îmraliyê li gorî standartên girtîgehên din e jî heta niha her tim di bin venêrandina MGK û Navenda Qeyranê ya Serokwezîrtiyê de hate meşandin. Di nav van 11 salan de tu standardên navneteweyî nehatin bicihanîn. Mafê sohbetê, mafê ragihandinê, mafê axaftina bi malbat û xizman re heta niha bi awayek bêdadî hate astengkirin. Her wiha saziyên mafên mirovan ên li Tirkiyeyê jî gelek caran bal kişandin ser van rewşan û wekî "Bêdadî nirxandin". Ocalan ku 11 sal e tenê tê girtin, heta niha 16 cezayê dîsîplînê lê hatin birîn.

Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan di 17'ê mijdarê de ji Girtîgeha Yekesî ya Taybet a Îmraliyê sweqî Girtîgeha bi Ewlehiya Bilind a Tîpa F a Îmraliyê kirin. Ev pêkanîna ji hêla hikûmetê ve wekî başkirina şert û mercan hate diyarkirin ji hêla Ocalan ve wekî, "Çala mirinê" hate nirxandin. Piştî vê mijarê, rewşa tenduristiya Ocalan û pirsgirêkên din jî hatin rojevê. Gelê kurd daket kolanan, saziyên civakî û DTP'ê bang li Wezareta Dadê kirin ku wezîfeya xwe bike. Wezîrê Dadê Sadullah Ergîn li şûna daxuyaniyek civakê îkna bike, îdiayên berê dubare kirin. Ergîn îdia kir ku Girtîgeha Îmraliyê jî wekî hemû girtîgehên din ên Tîpa F'ê ye. Lê saziyên mafên mirovan û gelê kurd ku bi rojê dehan nûçeyên der barê girtîgehên tîpên F de tên û pêkanînên Îmraliyê baş dizanin bi vê gotinê îkna nebûn. Ji ber ku pratîka 11 sal e li Îmraliyê gotinên Ergîn derew derdixe.

**Avakirina Îmraliyê**

Girtîgeha Îmraliyê ji hêla hikûmxwarek bi navê Fahrî Usta hate çêkirin. Girtiyê bi navê Fahrî Usta piştî dîwarên xirab bûyîn ên dêrekê temam kirin, serê wê girt û di 11'ê tebaxa 1935'an de Girîgeha Îmraliyê bû yekemîn girtîgeha nîvvekirî ya Tirkiyeyê. Cezayên Serokwezîr Adnan Menderes, Wezîrê Karên Derve Fatih Ruştu Zorlu û Wezîrê Aboriyê Hasan Polatkan ku di encama darizandina Yassiadayê de bi îdamê hatin mehkûmkirin, li vir hate înfazkirin. Cenazeyên wan 29 salan li Îmraliyê man. Li heman girtîgehê hunermendê esil kurd Yilmaz Guney jî maye. Piştî sala 1999'an Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dîl ket, di çarçoveya ewlehiyek taybet de anîn Îmraliyê. Têkildarî Îmraliyê hemû biryar bi destûr ji Wezareta Dadê tê girtin. Vê wezîfeyê li ser navê Navenda Rêveberiya Qeyranê, Buroya Îrtîbatê ya Qeyranê ya li Îskeleya Mudanyayê rê ve dibe. Piştî demekê bi guherandina rêziknameyê ev raye dewrî Navenda Rêveberiya Qeyranê ya Serokwezîrtiyê hate kirin.

**260 roj cezayê hucreyê dan**

Di nav 11 salan de heta niha 16 caran cezayê dîsîplînê li Ocalan hate birîn. Her wiha hemû daxuyaniyên Ocalan û tespîtên civakî wekî rêvebirina rêxistinê hatin fêmkirin û bi tevahî 260 roj cezayê hucreyê li Ocalan hate birîn. Li gorî salan di 2005'an de 3 car, 2006'an de 3 car, 2007'an de 3, 2008'an de 4, 2009'an de 3 car cezayên dîsîplînê yên di navbera 10 û 20 rojan de diguhere li Ocalan hate birîn. Her wiha hevdîtina parêzeran û malbatê re ku divê her hefteyê saetekê pêk bê, derxistin 15 rojan û bi nîv saetê sînor kirin. Ji ber vê yekê gelek caran heta 3 mehan jî hevdîtin pêk nayê. Ji ber van hincetan di nav 11 salan de Ocalan tenê karî 5 caran bi malbata xwe re hevdîtinê pêk bîne. Di 2009'an de jî hevdîtina Ocalan a bi parêzerên wî re 8 caran hate astengkirin.

**Hiqûq li Îmraliyê pêk nayê**

Odeya Ocalan 24 saetan bi kamerayê tê şopandin. Ligel vê yekê gardiyan, leşker û îstîxbarata li wir jî di navbera mazgalan re 24 saetan Ocalan dişopînin. Li gorî zagonan lazim e hefteyê bikaribe 10 deqeyan bi malbata xwe re bi riya telefonê biaxive. Bes heta niha ev destûr li Îmraliyê nehat dayîn. Tenê bi riya radyoya TRT FM dikare mafê xwe yê agahdariyê bi kar bîne. Weşanên rojane, heftane û mehane bi hefteyan nayên dayîn. An jî qastî nivîsên van weşanan jê tên kirin, tên rewşa nayên xwendin. Her wiha gelek caran bi hefteyan di ser rojnameyan re derbas dibin û wisa didin. Rojnameyên Ocalan dixwaze nayên dayîn. Ocalan tenê dikare pirtûkekê li odeya xwe bigire.

**Hate jehrîkirin**

Li gorî pisporê di encama hewayê giravê, bandorên neyînî yên tenê hiştina mirovan, tecrîd û îzolosyon di demeke dirêj de mirovan ji jiyanê qut dike. Li gorî pirsporan ev rewş dibe sedema tahrîbata rûhî û bedenî. Ligel vê yekê parêzerên Ocalan di 1 'ê adara 2007'an de li Romayê bi daxuyaniyekê ragihandin ku muwekîlê wan hatiye jehrkirin. Li ser vê yekê kurd ketin nav çalakiyan. Piştî çalakiyên kurdan Rêxistina Astengkirina Îşkenceyê ya Yekîtiya Ewropayê li Îmraliyê lêkolîn kir û daxuyand ku Ocalan hatiye jehrîkirin.

**ÎHD: Îmraliyê bêdadî ye**

Navenda Giştî ya ÎHD'ê di 10'ê cotmeha 2008'an de bi armanca balkişandina ser rewşa Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan rapora têkildarî Girava Îmraliyê weşandibû. Di raporê de zordariyên li hemberî Ocalan dihatin vegotin. Di raporê de hate daxuyandin ku di 1'ê hezîrana 2005'an de "Zagonên Ocalan" hatine derxistin û li gorî vê yekê der barê 16 parêzeran de doz hatine vekirin. Di raporê de hate derbirîn ku ji bo 12 parêzerên Ocalan her yekê cud salek ceza hatiye dayîn û piştî qediyana vî cezayî du caran 6 mehan hatiye dirêjkirin. Di 27'ê sibata 2009'an de de der barê 29 parêzerên Ocalan de doz hatine vekirin û di encama vê yekê de mafên Ocalan ê parastinê hatiye astengkirin. Di raporê de hate daxuyandin ku ji ber van pêkanînan diviya hevdîtinên ji sala 1999'an heta 2008'an 464 bûne lê ji ber astengiyan tenê 257 pêk hatine.

Her wiha di rapora ÎHD'ê de tê daxuyandin ku dema Ocalan anîne Girava Îmraliyê tu nexweşiyên wî tune bûne û niha nexweşiyên wekî anjîn, farnajît, alerjîk rînît, astim û gelek nexweşiyên din re rû bi rû ye. Di raporê de hate daxuyandin ku pergala Îmraliyê bi serê xwe bêdadiye û tenê-hiştin li gorî xwezaya mirovan nîn e. ENQERE (DÎHA)

# Li dijî tasfiyekirinê mîsyona gelê kurd

SEYDA PERÎNÇEK

Wek em tev dizanin ku ev serê hezar salan e gelê kurd ji aliyê dewletên desthilatdar û dewleta tirk ve di her dema jiyanê de hatine înkarkirin û hesabê temama hêzên navnetewî yên berjewendî aborî û siyasî li ser qirkirin û tunekirina gelê kurd hatine çêkirin. Gelê kurd li Rojhilata Navîn bi hebûna xwe, bi dîroka xwe, bi çand û hunera xwe, bi zimanê xwe yê dewlemend bandorê li ser polîtîkayên temama dewletên Rojhilata Navîn û yên navnetewî dike. Ji ber vê yekê ên ku pergala kapîtalîzmê di dest xwe de girtine û di her beş û qada cîhanê de xwedî hêzin di mijara pirsgirêka kurd de hesabên xwe û polîtîkayên xwe li ser tunekirin û têkbirina vî gelê mazlûm dikin.

Piştî 28 serhildanên ku li dijî vê hovîtiyê hatin çêkirin dem dem ev serhildan û ev berxwedanên pîroz têk çûn. Ji ber ku ên ku pêşkêşî û serkişandina van serhildanan kirin di têkoşîna xwe de têkiliyên wan ji hev qut bûn û bi vê sedema ji hev qutbûnê ev berxwedan û serhildan di demeke kin de ji aliyê hêzên dijî ve têk çûn û ew serhildan di warê çekdarî de hatin rawestandin.

**Di dîrokê de şoreşa kurdan**

Di rûpelên dîrokê de wateya serbilindiya gelê kurd bi xwîna mazlûman hatiye nivîsandin. Ev ji bo me rûmeteke mezin e. Piştî temama tevgerên ku serî li hemberî vê zilm û zordestiyê hildan, tevgera PKK'ê di warê çekdarî de di bin rêberiya birêz Abdullah Ocalan de dest bi şerê çekdarî û birdozî kirin. Di demeke kin de hêza PKK'ê di nava gel de hezkirin û bandoreke pir mezin danî. Roj bi roj xwe nû kirin, zanebûn, perwerde û hwd. di temama beşan de hêzên gerîla û PKK'ê li ser civaka kurd û Rojhilata Navîn hezkirina xwe mezin kir û mohra xwe li rûpelên dîrokê xist.

Ev pêşketin ji çavên hêzên navnetewî yên ku li dijî me hesaban dikin nereviya. Fêm kirin ku Serokatiya Gelê Kurd û tevgera PKK'ê dê pêşerojê li dijî temama qirêjî û polîtîkayên qirêj derkevin. Ev sekna tevgerê jî hesabê temama dewletên dagirker xiradikir. Ev tirs û xofa van hêzên ku li ser tunekirina gelên me bi şev o rojan lîstikên qirê çêdikin û xwe bi xwîna gelê mazlûm didin jiyankirin ketin hewldanên tasfiyekirina tevgera PKK'ê.

Çend caran li Kampa Bekaa xwestin ku Serokatiya Gelê Kurd tasfiye bikin, lê bi ser neketin. Çend kesên ji aliyê dewletê ve hilbijartin, perwerde kirin û li ser navê Ergenekonê hatibûn peywirdarkirin bi qirêjî di nava şoreşa kurd de bi cih kirin. Van kesên ku li ser esasê tunekirina şoreşa kurd cihên xwe demeke dirêj di nava têkoşînê de stendin. Van kesên ku bi zanebûn hatibûn amadekirin di nava şoreşê de di wan şert û mercên zor û zehmetî de dîsa bi pêşvebirina Serokatiya Gelê Kurd birêz Abdullah Ocalan hatin teşîrkirin û tasfiye bûn. Ev têkçûyîna ku di kesayetiya van kesên sîxur de hat dîtin lîstikên ku dewletê dixwest di nava hêzên gerîla de, di mêjiyên heval û hogirên me de nakokiyan derxin holê teşîr bûn û rûyên wan yên qirêj derket holê. Ev ne bes e kompoloya navnetewî ya ku li hemberî Serokatiya Rêberê Gelê Kurd hate çêkirin wek hûn jî tev dizanin pêşkêşiya vê komployê di serî de Amerîka, Yekîtiya Ewropa, û çend dewletên kapîtalîst kir.

> Di kesayetiya serokatiyê de dixwazin nirxên gelê kurd binpê bikin. Lê ên ku netewa kurd temsîl dikin qet tasfiyeyê qebûl nakin û sekna xwe ya şoreşgerî dê nîşan bidin

Serokatî ev lîstik jî bi pêşverû, zanistî û wê felsefeya xwe ya kûr vala derxist. A niha jî bi tecrît kirinê, di warê derûnî, tenduristî û wahşeta hovane dixwazin ku serokatiya vî gelî ji bin ve tune bikin. Ew nizanin ku felsefeya serokatî daniye holê bi hezarsalan wê serok û vî gelê têkoşer bidin jiyankirin. Ew nizanin ku tunekirina serokatiyê tunekirina temama Rojhilata Navînê. Ev zanebûn ev feraset bi vê dewleta desthilatdar re tune. Serokatiya vî gelî ev serê sîh salan e dîroka me, zimanême, çand û hunera me, mirovatiyame, nirxênme yên pîroz tev bi saya serê wî, gerîlayên serê çiyan, şehîdên qehreman û berxwedana hevalê zîndanê wateyeke pir mezin stendiye, cihê xwe di qada cîhanê de di asta herî pêşketî stendiye û bi rûmeteke pir mezin girtiye.

**Bi çand û hunerê têkoşîn**

Dixwazin ku di kesayetiya Rêberê Gelê Kurd de vê dîroka me ya hezar salan,vê çand û hunera me ya kûr û berfireh, vî zimanê me yê dewlemend û letîf, bi kurtasî temama nirxên me yên pîroz û hebûna me ji bin ve tune bikin. Lê bila her kes, her hêz dizanibin ku di serî de ên ku temsîliyeta çand û hunera kurd dikin vê bê rûmetiyê qebûl nakin. Bi çanda xwe, bi hunera xwe wê ev gel bersiveke dîrokî bidin van hêzên dagirker. Çima çand û huner? Ji ber ku di netewetiyê de xala herî grîng yekîtiya çand û hunerê ye, ya ziman e, ya dîrokê ye, ya axê ye, aboriye. Di kesayetiya serokatiyê de dixwazin van nirxên me yên netewî temama binpê bikin. Lê hunermendên kurd, nivîskar û zimanzanên kurd, dîrokzanên kurd, nirx parêzên kurd,û dewlemendên kurd, yanî ên ku netewa kurd temsîl dikin qet û qet vê bê rûmetiyê qebûl nakin û heta dawiyê çi hêz û qeweta wan hebe wê li hemberî vê pergala qirêj sekna xwe ya şoreşgerî di asta herî mezin de nîşan bide. Ev xeta dawîn e. Tu windakirinên me yên ku em xwe ji berxwedana vê pêvajoyê şûnde bigrin nemaye bila her kes vê baş zanibe.



# Konferansa Sînemaya Kurd dest pê kir




**Konferansa Sînemaya Kurd ya Navneteweyî ku bi çalakiyên cur bi cur yên li ser sînemaya kurd pêk tê ku gelek sînemagerên kurd beşdar dibin û dê heta 13'ê kanûnê bidome bi nîşandana fîlmê Ghobadî dest pê kir**



Konferansa Sînemaya Kurd a Navneteweyî ku ji aliyê Navenda Çandê ya Amedê, Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê û piştgiriya balyozxaneya Swêdê tê lidarxistin bi nîşandana fîlmê derhênerê kurd Bahman Ghobadî ya bi navê 'Nivê Heyvê' dest pê kir. Piştî nîşandana fîlmê resepsiyonek pêk hat û şaredar Osman Baydemîr di şevê de axaftinek kir û wiha got: "Ez di wê baweriyê de me ku ev konferans ji bo sînemaya kurd bibe gaveke girîng. Her wiha ji bo sînemaya Rojhilata Navîn û cîhanê bibe sedema pêşveçûnan."

Konferansa Sînemaya Kurd ya Navneteweyî ku heta 13'ê mehê bidome û di çarçoveya konferansê de çalakiyên sînemayê yên cûr bi cûr cih digirin bi nîşandana fîlmê Bahman Ghobadî ya bi navê 'Nivê Heyvê' ku di Sînemaya Avrupa de hat nîşandan û resepsiyonekê dest pê kir. Fîlm ji aliyê gelek kesan ve hat temaşekirin û her wiha şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê Osman Baydemîr jî fîlm temaşe kir. Baydemîr piştî nîşandana fîlmê di resepsiyonê de axivî û anî ziman ku heta niha li Ewropa û Rojhilata Navîn de li ser sînemaya kurd gelekî hatiye axaftin û panel hatine lidarxistin lê yekem careke ku li ser sînemaya kurd konferanseke evqas berfireh tê lidarxistin.

**'Bibe sedema pêşketinan'**

Baydemîr der barê lidarxistina konferansa sînemayê de ev tişt gotin:

"Ez di wê baweriyê de ku nîqaşên li ser rewşa sînemaya kurd ya niha û ya paşerojê ji bo pêşeroj û pêşketina sînemaya kurd bibe sedem. Zimanê hunerê cûda ye. Sînema jî beşeke hunerê ye û zimanekî sînemayê ya xweser heye. Ger em zimanê sînemayê fêm bikin ez di wê baweriyê de me ku em ê tiştên ku dijîn bi zimanekî gerdûnî bi riya sînemayê ve vebêjin. Ev jî dê ji bo aştiya rojhilata Navîn dê bibe gaveke girîng." Baydemîr li ser fîlmê Nivê Heyvê ku konferansa bi vê fîlmê dest pê kir ev tişt gotin: "Ev fîlm encama hîn tiştên ku hatin jiyandin û jiyan xwe bû. Ev kurteçîrokeke jiyana kurdan bû û ji ber vê yekê girîng bû."

Şaredar Osman Baydemîr di berdewama axaftina xwe de li ser konferansa sînemayê wiha pê de çû: "Ez di wê baweriyê de me ku ev konferans ji bo sînemaya kurd bibe gaveke girîng. Her wiha ji bo sînemaya Rojhilata Navîn û cîhanê bibe sedema pêşveçûnan. Ez careke din ji bo hemû kesên ku keda wan di vê xebatê de derbas bûye spasiyên xwe pêşkêş dikim. Ji ber ku em wekî şaredarî hem di nav vê xebatê de cih digirin û hem jî konferanseke wiha re malovaniyê dikin pir kêfxweş in."

**Sînemaya kurd nîqaş dikin**

Konferansa ku li Ewropa, Amerîka, Herêma Federal a Kurdistanê, Tirkiyeyê gelek derhêner, lîstikvan, rexnegirên sînemayê û akademîsyen beşdar dibin heta 13'ê kanûnê bidome û konferans dê bi kurdî, tirkî û îngîlîzî pêk bê. Di konferansê de hêmaya sereke ku bê nîqaşkirin nîqaşên li ser 'hebûn û tunebûna' sînemaya kurd e.

Sînemaya kurd hem dê di warê ziman de hem jî di warê mekan de bê nîqaşkirin û bersiva pirsên wekî; 'Gelo sînemaya kurd di binavkirina sînemaya welatan de cih bigire?', 'Gelo mimkûn e mirov behsa peyva sînemaya kurd bike?' bên dîtin. **AMED**

## Pirtûka 'Fîlozof û xasê ola Êzdiyatiyê'




PIRTÛKA Şêx Fexrê Adiyan ya bi navê 'Fîlozof û xasê ola Êzdiyatiyê' ji weşanên Dengê Êzîdiyan hat çapkirin û pirtûk li Oldenburgê li Almanyayê derket. Ev pirtûk li ser Şêx Fexrê Adiyan e ku di sedsala 13'an de jiyaye û yek ji mezintirîn zanayên ola êzidiyan e û gelek ji tekstên ola êzidiyan ji aliyê wî ve hatine nivîsandin.

Di pirtûkê de gotin û felsefeya Şêx Fexirê Adiyan cih digirin û Adiyan di gotineke xwe de wiha dibêje; "Min ilmê erdan tewa kiriye û ez ê herim ilmê ezmên bistînim." Di malpera Dengê Êzidiyan de ji bo nasandina pirtûkê ev agahî cih digirin: "Heta niha deng û rastiya Êzdiyatiyê di bin giraniya baweriyên zordestan de hatiye kerkirin. Ev baweriya kevnar û xwedênas, ku ji kûrayiya hezarên salan tê, ronahiya xwe daye riya gelek şaristaniyan û ji olên pey xwe re jî bûye bingeheke avakirinê - hê jî di nava zordestiyê, neheqiyê û tunekirinê de maye. Ligel xezeba dewranan jî dîsa ew maye weke rastiyeke mêjûyî, kevnar û bingeheke hêja ji bo gelê me. Niha dem hatiye, ku gelê kurd û bi teybetî Êzdî dikarin li vê ola hêja xwedî derbikevin."

Pirtûka ji 322 rûpelan pêk tê û her wiha di pirtûkê de wêneyên reş û spî jî cih digirin. **OLDENBORG**

# Di şeva çandên cuda de coşa govendê

Di Zanîngeha Neuchâtel a Swîsreyê de bi boneya betlaneya beşa Enstîtuya Çand û Zimanê Fransî ya Nûdem de şevek hat organîzekirin û di şevê de xwendekarên kurd bi kincên xwe netewî û govendan ve mohra xwe şevê xistin û rastî eleqeyeke mezin hatin.

Li Swîsreyê di Zanîngeha Neuchatelê de ji bo xwendekarên biyanî dersên zimanê fransî tê dayîn û Beşa Institut du Langue et Civilisation du Français (ILCF) (Enstîtuya Çand û Zimanê Fransî ya Nûdem ku girêdayî zanîngehê ye bi boneya dawiya perwerdeha demê û betlaneyê şevek hat organîzekirin. Li vir xwendekarên biyanî ku yên wekî ereb, îngîlîz, meksîkayî, çînî, rûs, kurd û portekîzî bi qasî 30 netewên cîhanê yên cûda li vir perwerdehiya zimanê fransî dibînin. Di şeva ILCF'ê de çand û netweyên cuda hatin cem hev û hîn xwendekaran bi çêkirina xwarinên netewî ve reng da şevê û hîn xwendekaran jî bi pêşkeşkirina govend, reqsan ve reng dan şevê. Bi qasî 150 kesî beşdarî şevê bûn û zarokên rûsî bi kincên Bavê Noel ve bernameyeke reqsê amadekirin û rastî eleqeyê hatin.



Di şevê de bi taybet jî koma kurdan ku bi kincên neteweyî û govendê ve çanda xwe dan nasîn rastî eleqeyeke mezin hatin. Xwendekarên kurd kincên neteweyî yên herêmên Kurdistanê yên wekî Botan, Riha û Amedê xwe kirin û ji aliyê xwendekarên netewên din ve rastî eleqeyê hatin. Di şevê de bi taybet jî dema xwendekarên kurd govend girtin rengîniya şevê derket asta jor. Xwendekarên kurd govenda bi navê çepik ve derketin ser dikê û xwendekarên kurd bi lîstina govenda Xelef ve dom kirin.

Govenda xwendekarên kurd ne tenê ji aliyê xwendekarên zanîngehê her wiha ji aliyê mamoste û hîndekarên zanîngehê jî rastî eleqeyê hat û dema govenda delîlo hat lîstin ev jî ketin govendê û têra dilê xwe govend girtin. Herî dawî jî hemû xwendekarên netewên din ketin govendê û hemû salon ve hev re govend girtin. Xwendekarên ku bi newayên muzîka kurd ve coş bûn nîşandan ku çandên cuda bi xwîşbînî çawa di nav hevde dijîn bû mînak. **NEUCHATEL**

## Wêne: Li Îzmîrê pêşangeha wêneyên reş û spî ya cuceyan





Pêşangeha bi navê 'Di nav jiyanê de' ku mijara wê jiyana cuceyan e ku wêneyên reş û spî pêk tê li Îzmîrê di Febrîqeya Dîrokî ya Havagazî de hat vekirin.

Pêşangeha wênekêş ya Tulun Şaşmaz Uzmez ya bi navê 'Di nav jiyanê de' li Îzmîrê Febrîqeya Dîrokî ya Havagazi hat vekirin. Wênekêş Uzmez ku bi xebatên wêneyên belgeyî dike piştî xebata xwe ya li ser qereçiyan niha jî berê objektîfa xwe da jiyana cuceyan. Di pêşangeha ku bi wêneyên reş û spî pêk tên de jiyana cuceyan ya rojane cih digire û Tulun Şaşmaz Uzmez der barê pêşangehê û xebata xwe ev tişt gotin: "Ez di wê baweriyê de me ku bi riya vê pêşangehê ve em ê hinekî bala xwe bidin cuceyan ku di jiyana rojanê de em wan berbiçav nagirin." Uzmez bilêv kir ku di pêşangeha wî de wekî mijar jiyana 9 kesên li herêmên cuda yên Tirkiyeyê cih digirin. Uzmez diyar kir ku yekem car li Tirkiyeyê xebateke bi rengî pêk tê û bi vê projeyê ve dê ji bo kesên din bê vegotin ku mirovên cuce ku parçeyek jiyanê ne. Pêşangeha ku ji 40 wêneyên reş û spî hatine kişandin pêk tê dê heta 10'ê çileyê vekirî bimîne. **ÎZMÎR**




www.arsivakurdi.org

# ZAROK

## Boyax







## Sewîlê sofî

Hebû tunebû, carekê ji caran, sofiyek hebû. Rojekê sofî sewîlê xwe girt çû serê kaniyê, da ku destmêj bigire. Sewîlê xwe danî bin latekê û çû ku destê xwe bişo. Vegeriya cem sewîlê xwe, dît ku lat bi ser sewîlê wî de ketiye, sewîl şikestiye.

Sofî gote latê: "Çima te sewîlê min şikand? " Latê got: "Nexwe çima giya di bin min de şîn dibe? " Sofî gote giyê: "Ji bo çi tu di bin latê de şîn dibî? " Giyê got: "Nexwe ji bo çi pez min dixwin? " Sofî gote pezan: "Ji bo çi hûn giyê dixwin? " Pezan got: "Nexwe ji bo çi gur têne me? " Sofî gote guran: "Çima hûn têne pezan? " Guran got: "Nexwe çima se têne me? " Sofî gote seyan: "Çima hûn têne guran? " Seyan got: "Nexwe çima kebanî me têr nan nakin? " Sofî gote kebaniyan: "Çima hûn seyan têr nan nakin? " Kebaniyan got: "Nexwe çima mişk hebanên me qul dikin? " Sofî gote mişkan: "Çima hûn hebanên kebaniyan qul dikin? " Mişkan got: "Nexwe çima kitik me dikujin? " Sofî gote kitikan: "Çima hûn mişkan dikujin? " Kitikan got: "Em birçî ne, em mişkan dikujin û li dora mala xwe çivan didin xwe. "



Sofî dîna xwe dayê ku dawiya van pirs û bersivên bi bahane nayên. Her kes li hev li bahanan digere. Dev ji wan berda û parçeyên sewîlê xwe dan hev û vegeriya mala xwe.

Çîroka min li diyaran,
rehme li dê û bavê guhdaran,
ji bilî fesadên ber dîwaran.


## Nêçîra Peyvan

Berçavk
Bawerî
Ewropa
Lêzim
Dahol
Laçik
Kebab
Bîst
Pol
Ter
Rim
Bîr




Hevalên delal, hûn dikarin peyvên li jorê yek bi yek di tabloyê de bi cih bikin?

## LABÎRENT




www.arsivakurd.org

## Şîna Leyla Qasim

*Serî hilde ji gorînê
temaşe 'ke hela Leyla
li ser te kurd dikin şînê
delala ber dila Leyla
bi destê dijminê xwînxwar
tu hat kuştin xuha perwer
ku derdên tey giran dan ser
hemî derd û kulan leyla
te bê tirs, canfida kurdan
werîsê meşneqa wêran
wekî ristek hil û mircan
vebestî gerdenê Leyla
şêrîna hem dem û yara
tu rewşa naz û dîdara
te em hiştin li şûn wara
li çol û kerbela leyla
li ser te em rengê goyînê
dirêjin hêstirê xwînê
Rijandiye li riya jînê
xwîna xwe wek gula Leyla
ciwan û rind û nû giştî
tu ev zincîr û ev piştî
li ser milê me tev hiştî
di nîv top û gula leyla
bi sûnd û soz û peymanî
ko heyfa te bi ser û can bî
li nik me dê çi erzan bî
tu bawer bî bila Leyla
divê xwîna xwe birjînin
ku em heyfa te bistînin
tu car em berno danînin
ji nav dest û mila leyla
Bi tevdîra xwe Berzanî
xeta cengê ji mer danî
Me bawerya xwe pê anî
Çi gel û komela Leyla
Me al hildaye ber jorê
Bi darê kotek û zorê
Di gel te ko neçî gorê
Bi hesret û bela Leyla
Em ê tabûtkê peyda kin
Ala rengîn bi ser dakin
Di ber dijmin re derbaskin
Di gel şêx û mela leyla
Tu xweş fexre ji kurda re
Bi kerwanê şehîda re
Dilê min tim bi heware
Ji rengê bilbila Leyla
Bi wê bejnê bi wê qamê
dema bighêje hendamê
Silav bikxas û wê amê
Şehîd û goriya Leyla
Bi wî rengî bi wê xwînê
Li tenişta şêx seîd rûnê
Tu gurzêd misk û beybûnê
Bidî ber wan, cilla Leyla
Digel Qazî Mihmed bî
Li nek Seyfî,Siyamed bî
Li cem Extî û Mehmet bî
Di rêza şêrgela Leyla
Ji derya hiş duran bînim
Bi zîv û zêr bineqişînim
Li kêla ber serîdeynim
Dîrok û cedwela Leyla
Bi te r yezdan dilovan bî
Bi dîdara xwe perwan bî
Te wargeh baxê Rîdwan bî
Di nîv sorgula Leyla
Heya saxim ezê bêjim
Li ser we mest û hem gêj im
Bi xweş xwanê xwe Tîrêj im
Ku la hewle wela Leyla*

***SEYDAYÊ TÎRÊJ***
***Jêderk: malame.org***



# Çîroka Xanê Çengzêrîn

XURŞÎD MÎRZENGÎ

Navê wî ji bûyinê vir de Xan e. Xan, zane û xanedan e. Siwarê hespê qer, ji nêçîrê dizivire. Li ser rê rastî birrekî pez tê. Nan û şîrê xav tên bîra wî: 'Ez ê li ba şivan dakevim..' Li dora pez dizivire, şivan nabîne. Dinêre li palê jor, şivan pişta xwe daye qurmê dara mazî, bûye berkole… Digihîje pêş darê, rebenê şivan ji westandinê, ji çi, di xew de çûye. Hay ji xwe nemaye, bi dengê piyên hespê Xan jî şiyar nabe.

Xan bîrbir, dûrbîn, fama û xwediyê xiyalan e. Li ser pişta hesp,ji bilî ku peya bibe, li şivan temaşe dike. Şivan di xeweke pir kûr de. Ya giyana wî jê çuye an jî dê here cergebaziyê… Şivan tasa şîrdagirtî li ber xwe daniye, bilûr berwar li ser devê tasê û di xew de çuye.Heyfa Xan lê tê ku şiyar bike:

'Gune ye, bila razê.' dibêje.

Xan li ser pişta hespê, heya şivan şiyar nebe, dê şivaniya wî bike…Li ser pişta hesp, çavên wî li ser şivan. Li dîdariyên (îfadeyên) sînçeyê şivan temaşe dinêre. Ruyê şivan bê endîşe, li ser bişirînê ye. Lê çiqas şad e? Nayê xwndin… Xan dibîne mozekî ji pozê şivan derdiket, di devê bilûrê de ket hundir, di binî de derket, bi alî çiyayê hember de firî û di nava zuxrê zinaran de, ji ber çavan winda bû…

Xan, moz bi bînahiya gurê şevên sibatê, salîse bi salîse şopand…Xan di nava fikarran de, hew dît moza şivan zivirî, hat di binê bilûrê re derbas bû, di aliyê pifkirinê re derket, di pozê şivan de ket hundir. Bi windabûna mozê re şivan bi veciniqandin şiyar bû. Şivan li Xan nêrî:

''Ez benî… We ez ji xeweke şîrîn şiyar kirim…''

''Xêr be birarzî, te xewn dît?''

''Qet nepirse, ez benî… Çarşiyeke xweş bû… Fena çarşiya zêrfiroşan…''

''Birarzî, meriv xewnên xweş bêje, di bîra meriv de dimînin… Xezîneya hişê meriv dewlemendtir dibe. Xewn û xiyal, du çiqilên darekê ne. Çika bêje, çi bû?''

''Ez benî, di ser çemeke spî re, ez di pireke heftçavî re derbas bûm… Gihîştim qûntara çiya. Di qefekê de deriyekî li min vebû… Ketim hundir… Nava çarşiyekê… Çarşiyeke pir mezin, di dikanên wê de durr û lal, ji sedef û mircanên çîxanokê binê derya bigire, heya aqût û elmas, lal, di dikanên çarşiya Sêgulî de refên dikanan dagirtî… Dîwarên çarşiyê ji zêr, qehtî ji zîv… Xweliya kuçe û kolanan ji tûnc. Dikanên mezin û qicik… Ferfûrfiroş, qîz û bûkên ji welatên zêrfiroş li pişta dezgeyên mircanîn… Ez di kuçe û kolanên wê eywanê, na na wê sûkê, dikanan de geriyam, min hîn tiştekî nekirî bû, we ez şiyar kirim…''

''Xewn e birarzî…''

Sibetirê Xan çû çiya, xulxulê moz ji ber çavên wî winda bûbû. Bi pencikan pê ket… Deriyek derket. Ket hundir. Salixên şivan... Çarşiyek ferfûrî, aqût û elmast, Xanê Kurdan di nav de…Xan zivirî, berê xwe da Text û Payê şah Ebasê Safewî. Dergevanan agahî dan şah, gotin:

'Reqîbê te yê santrancê hat.'

Şah, Xan kêzînê jor kir. Texteya kiş, (satranc) li ser maseya sedef danî. Piştî mirra şahane, Xan ji şah Ebas re got:'

'Îro şertekî min heye, şahê min…''

''Fermo bibêje, Xanê kurdan…''

''Ger tu min bibî, çi wext pêwîst be, ez ê ji şahê xwe re di eniya Xoresan, hêla Afgan de bibim serbaz. Ger ez qezenc bikim, tapuyê çermê gayekî xwelî dixwazim...''

Piştî pejirandina Şah, hesp û gergedan li hev siwar bûn, nefer û qele di nava piyan de tar û mar… Xan kiş bir ser… Ciyê revê nema bû, şah teslîm, rûçik lê sor bû…

Bi mêvanperweriya şahîn şah, Xan vegeriya. Çermê ga heft şev û heft roj ji nava avê dernanî, roja heştan deziyê çerm danî, deşt û zozan hilanî…

Şahîn şah bawîşk anî, ji jîriya Xanê Keyanî re kum danî, 'kişa' Xan bi bîr anî… Nikarî bibêje: 'Bêbextiye, bazara me çerm, ne dezî ye…'

Xan, deşt û zozanên bi deziyê ga pîvayî tapû kirin. Mîr û mele anîn, dîwarê Kela Dimdim idanîn. Xanê Kurd bû Xanê Çengzêrîn. Çima?



# *Nameyeke qedexe*

*tu dizanî
niha ez dîsa ji derve me
baran wek xunavê dibarê
dimeşim bi tena serê xwe,
wekî teyrekî ji refê xwe qetiyayî
tenê hestên min
hevaltiyê ji min re dikin
carna dikevim nav xeyalên kûr
zaroktî û hemû serpêhatiyên
xwe
bi bîr tînim
dibe ku hîn demdirêjtir,
bi tenê bimînim
tişta herî rast ew e ku
ji bilî mirov tu kesê mirov nîn e*

*erê havela min
jiyan carna,
dibistana herî mezin e
ji bo mirov
her tişta ji bo mirov bimînê
kar, emel û sekna mirovîn
gelo wê siberoja me
hesabê pêşeroja me karibe
bide an na
ew jî dîsa
wê jiyan û sekna min diyar
bike*

*heman tişt ji bo hestan jî wisa
ye
carna germ, carna sar dibin
bi qasî germahiya dilê min
hestên min niha,
mîna cemed bigirin sar in
nizanim di cîhana xeyalên min
de
her tişt rengo rengo bû
lê niha tenê reş heye*

*tu dizanî,
reş rengê şînê, mirinê û tariyê
ye
ez niha di cîhaneke tarî de
dijîm
siberoja min,
wê çi nîşanî min bide nizanim
tiştê ez dizanim,
ew e ku
bêrîkirinên min
wekî çiya mezin bûne*

*belê xoşewîsta şîrîn
hesreta di dilê min de
dikele wekî volkanekê
dibe ev evîn min bikuje,
an jî dîn bike,
lê ne xem e
bila birîna min
ji evîna te be
tenê tu min ji bîr neke
bes e ji bo min*

*erê hostaya xewnên min
min ji te re
vegotina xwe
bi dilekî birîndar,
bi zimanekî qedexe
anî ziman*

*mîna evîn û jiyana xwe ya qedexe
gelo siberojê,
ez ê karibim
bi zimanekî azad,
çîroka xwe ji te re bêjim,
an jî jiyaneke ne qedexe
bijîm*

*lê tu qet xeman nexwe
ne pisgirêk e ji bo min
bi her awayî
ez ê karibim,
bi evîn, ziman û hestên azad
bijîm.*

*bi hêviya
hevdîtineke
bêastengî û ne qedexe
dîsa ez çavên xwe
di dilê te de diçemînim
te di nefesa xwe de hîs dikim
û di kena xwe ya birîndar de
bi bîr tînim.....*

***DILHEJAR***

www.arsivakurdi.org

ROJEV
6 Kanûn 2009 Hejmar: 24 Sal: 1 E-mail: awelat2002@yahoo.com

## Nexweşiya AIDS'ê sedema mirinê ya 4'emîne

Nexweşiya HIV-AIDS li Afrîkayê yekemîn sedema mirinê ye. Her wiha bi giştî li cîhanê jî çaremîn sedema mirinê tê zanîn. Li gorî daneyên Wezareta Tenduristiyê ya sala 2008'an li Tirkiyeyê 3 hezar û 370 nexweşên HIV-AIDS'ê hene. Bi hevkariya Wezareta Tenduristiyê, Navenda Lêkolîn û Tedawiya AIDS'ê ya Zanîngeha Hacettepeyê (HATAM), ji aliyê Komeleya Piştevaniya LGBTT a Jiyana Pembe lêkolîneke pêk hat. Di lêkolînê de derket holê ku nexweşiya AIDS'ê sedema mirinê ya 4'emîne. **ENQERE**



# Beşîktaşê Diyarbakirspor bi kulîlkan pêşwazî kir

**Di 15'emîn hefteya lîgê de Beşîktaş û Diyarbakirspor li sahaya Înonuyê hatin hemberî hev. Alîgirên Beşîktaşê helwestek mînak nîşan da û Diyarbakirspor bi kulîlkan pêşwazî kir**



Diyarbakirspor ev demeke dirêj e li bajarên din rastî êrîşên nijadperest dihat. Ji ber vê yekê jî êdî hatibû asta ku ji lîgê vekişe. Lê li Stenbolê ku gelek kurd le dijîn bi kulîlkan hat pêşwazîkirin. Diyarbekirspor li stada Înonuyê bi kulîlkan hat pêşwazîkirin.

### Gogbaz bi destê hev girtin

Gogbazên her du tîman bi destê hev girtin û derketin sahayê. Gogbaz û rêveberên Diyarbakirsporê ji vê rewşê gelek kêfxweş bûn. Her du tîman jî xwest ku ev rewş ji tîmên din re jî bibe mînak.

Alîgirên Beşîktaşê bênavber dirûşmên "Em Beşîktaşî ne, li dijî nijadperestiyê ne" berz kirin li ser vê alîgirên Diyabakirsporê jî dirûşma "Beşîktaş" berz kirin û li ser vê yekê alîgirên Beşîktaşê ji bo Diyarbakirsporê li çepikan xistin. Piştre alîgirên her du tîman jî bi hev re dirûşmên "Reş û spî" û "Kesk û sor" berz kirin. Di 15'emîn hevteya lîgê de Beşîktaş û Diyarbakirspor li Stenbolê, di sahaya Înonuyê de maçek lîstin. Maç bi 0-0 bi dawî bû.

### 'Em ji bo pûanan hatin'

Ziya Dogan anî ziman ku Beşîktaş reqîbeke jê hatiye û wiha axivî: "Reqîbê me di serê lîgê de serkeftineke mezin bi dest nexist lê bi sekeftinên xwe yên dawî bû namzetê herî mezin ê şampiyoniyê ye. Moralê gogbazan jî li cih bû. Maçeke bi zehmet li pêşiya me ye. Em dixwazin ku îşev maçeke baş nîşanî alîgirên Beşîktaşê bidin. Em dixwazin ku bi 3 pûanan ji vir biqetin. Heke ku 3 pûan nebe jî em dixwazin herî kêm bi pûaneke ji vê vegerin. Tiştek ku mirov lê zêde bike tune ye. Em ji bo pûanan hatin."

Heta niha Diyarbakirspor û Beşîktaşê 20 maç lîstine. Di van 20 maçan de, Beşîktaş di 10 maçan de, Diyarbakirspor di 5 maçan de bi ser ketiye, di 3 maçan de jî beramber mane.

### Ji alîgirên Beşîktaşê re spas kir

Gogbazê Diyarbakirsporê Şener Aşkaroglu, diyar kir ku ew di dewreya yekem de zêde bi serkeftî nelîstine lê di dewreya duyemîn de bi awayekî serkeftî lîstine û wiha axivî: "Em ji encamê kêfxweş in. Di nav vê hefteyê de hinek zehmetî derketin pêşiya me. Em ji bo rûmeta xwe û Amedê lîstin. Em xweş lîstin û xweş beziyan. Ji ber ku em destvala venegeriyan kêfxweş in. Dibe ku em bi vê pûanê di lîgê de bimînin." Şener ji alîgirên Beşîktaşê ku ji bo dekevin trubînan bang li wan kirin spas kir û wiha pê de çû: "Divê li Tirkiyeyê tu cûdaxwaziyên siyasî û nijadî tune bin. Di çend maçan de tiştên nexweş qewimîn. Îroj dîmenên gelek xweş derketin holê."

### 'Divê ku hinek vê rewşê çareser bikin'

Gogbazê serkeftî yê Diyarbakirsporê Tolga Dogantez, derbirî ku ji ber hin pirsgirêkên aborî di tîmê de hin pirsgirêk derketine û wiha pê de çû: "Wekî ku tê zanîn di nav hefteyê de çend pirsgirêk derketin. Di nav kulûbê de pirsgirêkên aborî hene. Me tu carî vê pirsgirêkê ji derve re venegotin. Di nav tîmê de hin hevalan pere negirtin.



Lê ez naxwazin podagojiyê bikim. Tîma me di bin şertên gelek giran û zehmet de hat van rojan. Em di dewreya yekem de xweş nelîstin. Lê di dewreya duyemîn de bi guherîna lîstikvanan, lîstikeke xweş derket holê. Pêwîst bû ku em bi rûmeta xwe bilîzin. Diyarbakirspor, tîmeke ku dikare pirsgirêkan çareser bike û çavkaniyên xwe biafirîne ye. Divê ku her kes destê xwe bixe binê kevir."

Ziya Dogan di nav Beşîktaşê de gihîşt. Bi salan formaya reş û spî li xwe kir. Dogan piştî ku gogbaziyê berda di hin tîman de antrenorî kir. Bi gelemperî 15 caran li dijî Beşîktaşê derket maçê. Di van 15 maçan 9 heban de têk çû û di 6 heban de bi ser ket. Piştî maça Beşîktaşê gelek kêfxweş bû. Ziya Dogan wiha got: "Me hêza Beşîktaşê û hêza alîgirên wê dizanibû. Di dewreya yekem de wekî ku me dixwest em nelîstin."

### 'Em bi du antreman hatin'

Ziya Dogan derbirî ku ew tenê bi du antremanan derketine pêşberî Beşîktaşê û wiha got: "Me di serê sezonê de jî antreman nekiribû. Ji ber vê jî lingê hin gogbazan diêşiyan. Rêveberî dibêje ku em dê di dewreya duyemîn de ji hêla aborî hinek rihetir bibin."

### 'Amedî gelek hêja ne"

Piştî maçê qelevanê Diyarbakirsporê Gokhag Tekgoz jî gelek kêfxweş bû. Tekgoz, bilêv kir ku wan hêza Beşîktaşê dizanibû û wan li gorî hêza wan xwe amadek kirine. **STENBOL**



Encamên maçên ku Diyarbakir û Beşîktaş li Stenbolê lîstine wisa ne:

1977-1978 3 - 2
1978-1979 2 - 0
1979-1980 2 - 1
1981-1982 1 - 1
1986-1987 4 - 1
2001-2002 4 - 0
2002-2003 2 - 0
2003-2004 1 - 0
2004-2005 4 - 0
2005-2006 1 - 1

## Dêra Mor Loozar hate texrîpkirin

Li gundê Habunnesê ku bi ser navçeya Mîdyata Mêrdînê ve ye Dêra Mor Loozor a 2 hezar salî ku ji aliyê suryaniyan ve tê bikaranîn, qûleya wê ya înzîvayê ji aliyê hin kesên ku nasnameya wan nayê zanîn hate taxrîpkirin.

Li gundê Habunnesê Dêra 2 hezar salî ya suryaniyan Mor Loozor



qûleya wê ya înzîvayê ji aliyê hin kesên ku nasnameya wan nayê zanîn hate taxrîpkirin. Bilindahiya qûleyê 6 metre ye.

Der barê bûyerê de serokê Komeleya Dîaloga Nava Şaristaniya Mehmet Alî Aslan daxuyaniyek da û diyar kir ku vê êrîşê şermezar dikin û wiha pê de çû: "Di vê pêvajoyê de êrîşeke wisa hov e, qet ne baş e. Em vê êrîşê şermezar dikin."

Aslan anî ziman tu eleqeya vê êrîşê bi gundiyan re tuneye û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Gundiyên me xwedî li malên xwe derdikevin. Hem musliman û hem jî suryanî bi awayekî taybet mizgeft û dêrên xwe diparêzin. Kevirek jî ji dîwarê dêrê an jî mizgeftê bikeve qebûl nakin. Ev feraset bi salan vê dêrê diparêze. Gundê me di warê 4 ziman û 4 olî de hate hilbijartin. Lê derket holê ku bi vê êrîşê dixwazin pirçandiyê parçe bikin." **AMED (ANF)**

## Ji bo kevneşopiyê têdikoşin

Li Hatayê zeytûn çavkaniya herî girîng a debarê ye. Li bajar zeytûn ne bi rêbazên modern bi rêbazên taybet yên kevneşopî tên hilberandin. Ji bo ku ava meşhûr a zeytûnan derxînin hemû zehmetiyan didin ber çavên xwe. Ava zeytûnê bi taybetî di meze û taştê de tê bikaranîn. Ji bo ku vê ava zeytûnê bi awayekî hêsan derxînin holê li Zanîngeha Mustafa Kemla beşên lêkolînê hatin avakirin.

Di salên dawî de li Hatayê gelek fabrîqe teknolojiyê dişopînin. Ligel ku ev fabrîqe teknolojiyê bi kar tînin, cotkar ji bo ku kevneşopiya xwe bidomînin ber xwe didin. Wekî hûn jî dizanin li Hatayê 'ava zeytûnê' cihekî girîng digire. Wekî meze ser her sifreyê cihê xwe digire. Hilberînerên zeytûnan bi rêbazên xwe yên xwezayî hilberîna zeytûnên xwe dike. Ava zeytûnê jî bi rûnê zeytûnê tê çêkirin.

### 'Tehmeke cudaye'

Li Hatayê ava zeytûnan di demên dawî de di fabrîqeyan de tê çêkirin. Lê cotkarê bi navê Mehmet Karagule û kurê xwe, ava zeytûnê bi derfetên xwe çêdikin. Karagule zeytûnan dike bin kevirên giran û bi alîkariya hespî rojekê seranser dipelçiqîne. Karagule der barê vê de axivî û anî ziman ku ev karekî gelek zehmet e lê ji bo ku tehma wê xweş e, ligel hemû zehmetiyan vî karî dikin. Karagule wiha dirêjî da axaftina xwe: "Jixwe li hemû fabrîqeyan rûnê zeytûnan tê hilberandin. Lê tehma ava zeytûnê cuda ye. Em bi salane ji bo xwe ava zeytûnê çêdikin. Em jî mêvanên xwe de jî pêşkêş dikin. Em hilberîneke xweş derdixin."

Li Hatayê buhayê rûnê zeytûnan li gorî cureyê diguhere. Buhayê rûnê zeytûnan di navbera 4.50 û 6.00 de diguhere. Ava zeytûnan jî di navbera 7.00 û 7.50'an de diguhere. **HATAY**



www.arsivakurdi.org